



**Weşanên Ronahî**

F E Q Î Y Ê   T E Y R A N

# T E M B Û R



W E Ş A N Ê N   R O N A H Î

HEVRA, KOMELA ŞOREŞVANÊN KURDÊN TİRKİYE
8061 Zürich 61 - Hirzenbach
Postfach 200 / Schweiz

# PÊŞGOTÎN

Navê şayîrê kurdayî qurne orteya klasîk FEQÎYÊ TEYRAN nava xelqêda gelekî eyan e. Mîrata efrandinê wîye dewlemend bi zar hatîye xweyîkirinê, ji silsiletekê derbazî nava ya dinê bûye û wî teherî gihîştîye rojên me. Nava xelqêda ew efrandin eyanin bi navê avtor, têne gotinê çawa şîer (helbeste) û beytê Feqîyê Teyran. Heyf, wekî helbestên ku şayîr bi destên xwe nivîsîne nemane, nehatine xweyîkirinê. Tunene usa jî destnivîsarê merivê hêna Feqîyê Teyran. Dêmek, temamîya efrandinê şayîrê Kurda tenê bi zar gihîştine me.

Xebera zarkî, femdarîye, nava weda (wextê) dirêj de, çaxê ji silsiletekê derbazî ya din bûye, hatîye guhastinê, kêmayî û zêdeyî ketîye nava wan efrandina, her merivekî alîyê xwe de "çêkirî-ye". Aha bona çi em niha rastî qedandin-gotinên efrandinekêye cure-cure tên. Carna firqîya nava têksta efrandinekêda êpêce ye, carana jî lap hindik e. Lê em dikarin bêjin, wekî nava şîerê ser navê Feqîyê Teyran himlî cure , stîl, ziman û xwexwetîya nivîsara şayîr hatîye xweyîkirinê. Lema jî şikberî himberî wê yekê tune, wekî gelek efrandin yê Feqîyê Teyran e.

Nava vê berevokê de ew efrandin hatine ciwarkirinê, kîjan Aramê Çaçan ji nava binelûyê Kurd berev kirine.

Em himberî hinek efrandinê vê berevokê şikberin, wekî ew yê Feqîyê Teyran in, çimkî ewana bi stîl, ziman û cûrê xwe ji efrandinê wî ye eyan cuda dibin. Lê çimkî qîmetê wan efrandinaye zargotinê (folklorê) heye, ewana nava berevokê de mane.

Bira zanevan-pêşekzan paşwextîyê wê pirsê safî bikin, çiqas ew efrandin yê Feqîyê Teyran in yanê na.

JÎ ALÎYÊ REDAKTOR

Xwendivanên Hêja!

Ev pirtûk, "TEMBÛR" ku em derpêşî we dikin, di sala I974 an de cara pêşîn li Ermenîstan/Revanê, bi tîpên kîrîl (rûsî) hatîye çap kirin.

Aramê Çaçan ê ku ev pirtûka hazir û berev kirîye, ji kurdên Sovyetîstanê ye û li Ermenîstanê dijî. Me ew ji tîpên kîrîl guhirande tîpên latînî û ji nu ve çapkir.

Ronahî

Cile (ocak) I976

## SEREBEND

Kanê Elîf, kanê Emîya
Kanê Hecem, kanê Ewlîya

Qence mirinê nekin bîr,
Kanê xelqê alimê û jîr,
Ew jî ber mirinê dibine hêsîr.

Qence mirinê xiyal mekin,
Dest xêr qencîya bikin,
Derewa mekin, qencîya bikin.

Kanê xasê vir dixas,
Kanê Hemeze, kanê Abbas,
Wana axêda girtibûn qeyas.

Kanê, xasê vir di Şefîq,
Kanê evdalê mal bi sedîq,
Wana jî axêda girtin terîq

Kanê Îsa, Îsayê qedîm,
Kanê Mûsa, Mûsayê kilîm,
Ew jî çûne hizûra mal rehîm.

Benî ademo, vê dinê nebe tima
Mal zêr xwe neke bar û cema
Dinya hebûbeta Xwedê re jî nema.

---

WEFATBÛN

Lawek hîm dibû li mektebê
Ew bedewbû weka stêrka sibê.

Ew bû delalîyê dê û bavê
Nûr û neder dibanî lêvê.

Mirina decal
Neda mecal

Ṣtêrkek rijîya erşa
Silav da ax û ferşa

Ew tune şaristan
Bû mêvanê garistan.

---

## BİLBİL

Bilbil rabe bihar e
dilî pir xedar e,
Tijî pêlît nare.

Kolî bilbil
Bicivî gul,
Dilî kul.

Çû bilbil
Vebû gul,
Axîn û kul.

Feqîyê Teyran
Dilik kul
Çewa bilbil.

Kire axîn bi kul
Dîhar e sura dil,
Bilbil çû bê dil.

---

## AXÎN

Axîn tê min şev û roja
Xewa min tehîrî ji çava
Xaşîn tê ava şev û roja.

Xewê şeva min bûne bar,
Dêdema te qedîm û yar
Bûme maşaqê dilê yar.

Hey ĥorîya bihuştê
Bejn bal hertim te tê,
Şirêta perîya teya tê.

---

## MİLKÊ RÊZÊ

Ėrd bûne milkê rêzê
Cotkarî ezim, sibê hozê,
Tebîyėt nas nake gerdan gazê.

Ew mêrga cewek dinav
Belgê mêrgê zêr û dirav,
Min qutar nekir biçûma nav.

---

## AXÎNA FEQÎ

Axîn dikim gele bethal...
Destî zulma wî mîrê kal,
Ji zanîyê bûme ewgar.

Tengezanê xwe vî dilî,
Herça ku evî gilî,
Badîhewa nakim girî...

Erzan nabin ehliyê qîmet,
Xirab nabin merîyê ciblet,
Ne lazime qencîya minnet.

Ew bendene, tev feqîrin,
Dijmin ewin timê mîr in.
Çiqas başbin dîsa qîrin.

Erd û ezman tev bûne tas
Berêd giran bûne rusas,
Gilîyê pêşiya dibine bes.

Axîn dikim ax... û ax...
Kengê bê mecal û çax,
Dinya hevra bibe qultax.

---

## MÎRÎN

Ax û kesera mirinê
Ranabe ji dinê

Şî û girîn bê feydeyî
Alikî dinê şîn, yek şayî.

Dinya baş e, bê feydeyî
Kesîra ne bav e ne jî dê yî.

Axir axir mirin heyî
Kirrîn, firotin benîyayî.

Dilo çiqas jarî
Feqîyê Teyran neyar î.

---

## FEQÎ Û ŞÎVAN

-Hê şivanê zewal!
Bê xem û bê xiyal
Kê re dikî qale-qal.

-Bilbilê Feq ê kal,
Ketî çola bê heval,
Bona horîya gerden xal!

-Herê-herê şivan kemal,
Eşqa dila nakim betal,
Meşûrin zendê bi xirxal.

-Erê Feqîyê meth bal,
Qelema te nûr şemal,
Dixulxul nolî kanîya zelal...

---

FEQÎYÊ TEYRA HEPSÊDA

...Bira bihata qasidê çiyane,
Tev min bikira xeberdane,
Ka halê dîlberê çawane.

Xwezî derê hepsê vebûya,
Dest qewazda efû hebûya,
Merema dila wê safîbîya.

Bira qasid mêzekira
Derê hepsa xwe vekira,
Ez efûkirama ji van dera.

Bira qasid bihata vê nedîrê,
Şirît bavîta hepsa bîrê,
Ez efûkirama jî vê qîrê.

Bihata qasidê şîrîn mestî,
Kilît-mivte bida destî.
Derê hepsê bikira qestî.

Xwezî tofanê bilîlanda,
Mezîla dirêj biqetanda,
Heps û zîndan welgeranda.

Efû kirina girtîyê hepsa,
Pale kirina serê ser belgîya,
Azad kirina nefsê tengîya.

Hepsa mîrê gel xedar e,
Çar çarnikal nobedar e,
Têda girtîye bendê jar e.

Bend e têdan bê qeyas in,
Topek bê sûce bê biniasin,
Gelek kesîb kusîbê firar in.

Ew bendê têda girtîne,
Her bê sûce bê gilîne,
Ewan haj tişteki nîn e.

---

GİRÎNA FEQÎYÊ TEYRAN

Werin, lêzim werin,
Cînar, xelqê hêşator,
Hûn rojekê tivdîr bikin,
Qewîn îro girîyê min tê.

Qewîn îro me tê girî,
Sosin li mêrga qewrî,
Sed heyfa lêvê şekirî,
Nagirin fîncana şerbetî.

Lêvên narîn, nûr şekir,
Lêkin hûn du rexber,
Sed ax kovan û keser,
Hêsîr tijî bûne li ser.

Sed heyf lile çû hêcetê,
Sed heyf lile çû lê cuda,
Heça emrê me ji wê da tê,
Em razîne ji emrê xuda.

Her ça dike, ew mîr dike,
Xêr û şera tivdîr dike,
Dayna û qelpa pir dike,
Dimrim derdê firîyaqetê.

Dengê dîlbera horî,
Gelo yarek me dibû peyda,
Zerî feş bû hat bihurî,
Weke dilê min tîrek lêda.

Weke dilê min tîrek dijar,
Serê pêda, dil da çûxar,
Min qalme-qale, wax waweylêr.

Şibêta bilbil bixûnim ezê,
Di zîndanêda, di hepsêda,
Mîna Ûsibê Kelhanîyê,
Mîna dînê derêda.

Kirime hêsîrê rihane,
Ferqût dame ber çoxane,
Qey diçû, eşq û mihubet hebî,
Nebî te beytil metrûbek.

Eşqê baxê xwe bî,
Şibayê qelpê te bî,
Herê av bi av,
Diçî tu hergav.

Kê re dikî vê tayetê,
Emrê kê lez wa tê,
Avê got:
-Me bihurî sal û zeman,
Kesî nekir pirs û hewal
Pêxambera aqil hebûn,
Ew hewceyê pirsa nebûn.

Ez xar bûme, hûn rast bikin,
Xewna Feqî şîro bikin.

Feqî got:-
Ezê ser sewdayê xwe dîn im.
Ser aqlê xwe namînim,
Ez Ebo-Sîno ji ku bînim.

Mecrûma dilê min bike rayê,
Daxa dilê min sax nakin,
Hekim bi xwe Loqman bê,
Daxa dilê min sax nebitin.

Dax dovana dilê mino,
Saydê li min daye,
Binê behra mezin daye,
Bilgîzê nayê cihabe:

Şerbeta lewz û kulma,
Nîvek tasa cama,
Da destê xasa û ema.

Emê çi bikin cinnetê,
Tê werkî xal û zilf,
Tê werkin xûng û gulaf.

Ezê digirîm, dikim şêwirê
Barê daye ser vavêrê,
Edî şîret nayêne kêrê.

Ezê digirîm gavekê nerm,
Dinyayê rabû heya û şerm,
Xelqê buxdana dayne ser me.

Ew ciniyazê orta herdu ava,
Hêsir çûne herdu çava.
Dixwazin ezabê dê û bava.

Ew ciniyazê serê kanîyê
Hêsîr çûne li enîyê
Wana dixwazin ezabê cînarîyê.

Dinya xan e, xan û man,
Bend e têda bezirgan,
Kanê filan û bêvan.

Dinya xan e, xan bi tijî,
Bende bezirgane, têda tijî,
Hinek dimirin, hinek dijîn.

Mîr Mihê heyşt felek diçûne,
Dewra bedîl gelek diçûne,
Tu bizanbe I04I diçûne.

Mîr Mihê, Mîr Mihê
Nehsed salî dinê bikî sihbê,
Tê rojekî bidî methê mirinê.

Ew dema pey reşkala,
Çi re dişxulin hemû cara.
Xezal hatine dîhara.

Ew gunê me eyn û zara,
Ew gotina Feqîyê Teyran,
Reme dê û bavê hadêr û gudara.

---

ERNÛSÎ

Axa û teqal hev nîşan şêwerkirin,
Xeber-xebera derxistin û mezin kirin.
Hespê Ernûsîyê anîn zîn û hevsar kirin,
Am û tam Feqîyê Teyran lê sîwarkirin,
Çiluxî û pêxîlîya giran-giran pê kirin.

-Got: Mîr sax be li dinê be,
Mîrê şerqê hetanî Şam be,
Duayê xudê tim lê be,
Bira qesira mawer lê helal be,
Bira Feqî dîwanê ne şu ul.

-Mîr Selîm got: bêjin çi hewal?
Xweş-xweş we nayê tu sewal
Temam hatin teme ne bûn bal,
Çav herdu nihêrîn buxudan kirin.

Wana hevra girtin mecal
Gazî feqî kirin ji mala,
Anîn dîwana mîrê zewal
Feqîyê Teyran kirin hewal.

Gotin: Feqî nelet û pal,
Derê mizgîtê dada ker û lal
Nade metihê xudê minî kemal.
Bê xudayê bê kemal?

Gotin: Feqî tovê dara biyê çi mal e,
Feqî got: min û we nu tu hal e,
Qehbeta re tu car nabim hewal,
Bira hepis min re bibe mal.

-Berê ewlin silav,
Paşê pûnên kulav
Tovê dara bînê av,
Ez we nakim tu silav.

Feqî kirin zîndana zewal
Dil Mehmûd Feqîyê delal.
Defter û qelem nehiştin bal,
Bira hepsêda bimîne qer û lal.

Feqîyê Teyran got:
Ew hepsa mîrê xedar
Min re bûye mal
Ezê bikime qal-qal
Bira bê dengê minî zewal.

Fewrar min bê yeko cemal,
Dinê herim bê xem û xiyal,
Ezmana bê dengê Mecrûm-Leyla,
Zîndanêda bû nalînê Ûsibê delal.

Rica tu kesî nakim, tobedarim,
Qebreta re tu qir-qir nakim,
Methê dîlbera Şebab bidim,
Meşxûlê baxê rezên xwe bin.

Navê Mecrûm û Leylê dinê,
Methê Ûsib û Zelxê wê bê gotinê,
Bira minxin qebxet tîrê janê.
Bikim qale-qal Dîlber canê.

---

## WÊ HÎLŞE PÎRA ZULMKARA

Pirak heye, piraka xayîna
Hatîye çêkirin hukumê mîra,
Wê rab elkanê merîya tofan
Wê bihedimînin serî heta ban.

Xuzil hebûya pirak usa
Dîrek qedîm weku rusa,
Ezê bikaribim herim sera.
Weku nehedime kok û binva.

Wê bê çêkirinê pirak usa
Kember bestî, zirî û pola
Edî bê tirs herim sera-sera.

KAXEZ

Min nivisî ser kaxêza,
Zef û bendê mithey re.
Xuzila yekî bigota,
Dergek vebû Kurda re.

Hetanî kengê binivîsim awa
Îşq neman bînayê çava
Guhê sekin rojeke aza
Bê dengê sicûda Kurda.

---

DEWRAN

Me li wa dewran bi dor,
Gelek jêrin, gelek bi jor,
Şuxulê mîra timê bi zor.

Şuxulê zor destê mîra,
Xirab e halê me feqîra,
Kes guh nade jar, sefîla.

Jar, sefîlê em dibêjin,
Derd, kula tev dirêjin,
Destê qûltîyê qer e - gêj in.

Wê bên dewranê serobin,
Tevê bide ser serê min,
Heye wede dirêj û kin.

Wexta ku bê wedê şemal,
Wede ku bê nade mecal,
Wê undabin derdên xedar.

Derdê keser gel bê qeyas,
Bendê merûm bê sûc binyas,
Ji zor zulmê nabin xilas.

Her dewranê edil mor in,
Dilê tijî bedhal in,
Ne hewceyî pirsê sar in.

Qise ew e bê gotinê,
Ku nabe elam idnê,
Dewranê baş bivne xinê.

Wê bên dewranê kibîr,
Namînin hakim û mîr,
Lazim e hingê benda tivdîr.

---

GÎRTÎN

Ewan qecera girtim bi coc,
Dîwanê li min kirin xuroc,
Ez kirime hepsa mîr xuroc,
Her tişt betal û boş.

Hosta ji rizmê hecîya,
Tîtim çûn dil teqîya,
Mobeta dilê xefîya,
Dengê zor hukumeta.

Ewe manî ku bikin kî ne,
Ew mêrê bendê xalfîne,
Pêpasdikin risqet û îmane,
Ne dergene ne dîwane.

Girtin mêra re lazim e,
Ceger lê bibin qalim e,
Dilê nexweş tune dermane,
Girtî zîndanêda çiqas man e.

Ew hukumê dîn durista,
Elkanên pût û parista,
Ew dîwanên ruşvet xwera,
Mexlûqet yekin hevra bira.

Bipirsin merîyê alim û jîr,
Xwe re bikin rav û tivdîr,
Heta hebin şah û mîr,
Win nabînin risqeta kibîr.

Bidin min feqîrî destûr,
Ezê herim qurbeta dûr.

---

## WÊ BÊ ZEMAN

Kanê, niha nayê,
Dewran bêne dinyayê,
Em derên zora şefayê.

Dewranêke kefil-deman,
Soz qirar bivne temam,
Lê kivş bike xas û xam.

Zeman hevere bi dor,
Wê undabin cebir û zor,
Bendê rabin gele pispor.

Wextê bê zimanê merîya,
Aqilê bê mejiyê serîya,
Wê bîr bînim Feqîyê Teyran.

---

## MÎSKÊN

Birîna min xedar,
Ez kirime dero-der,
Dikim axîn, dikim hewar,
Birîna xedar tune çare.

Birîna mir kur e ji kezebê
Felek xayîn e min re nabe,
Dilê keder belgê gulê
Ku xeyîrî îdî nayê emelê.

Dilê birîn keder û kîn e,
Ax misken çiqas şîrin e,
Mirin erhedeyî yek ber nîn e,
Îro heme, sibê çuyame.

---

BİRATÎ

Em ne dûrin ji hev
Me silav daye hev.
Sidiqê qenc nav,
Litbê şîrin biratî tev.

Ez û tu ji axekê,
Av vexwarîye kanîkê,
Em hogirin ji rêkê,
Hetanî roja mirinê.

Em in milkê rêzê, rîya şedê.
Îro ez û tu, sibê hinekê dinê
Weten şîrin wekî şîrê de,
Feqîyê Teyran revîye qurbetê.

Bûme mêvan malekê
Nan anîn ser sifrekê
Me xwar pir dua kir
Me şîrin hevra qisekir.

-Xwedîyê malê camêrekî rûspî
Got: min çira di kewgirî?
Ev mêrê mewtê te bibi kî alî,
Dibe tu emelekî bê colbet kirî.

-Na xêr bira rû spî can,
Min mîra û hakima ne minnetin,
Şer kim bona rojgora nûr,
Natirsim qurbetê welatê dûr.

-Rû spî nihêrî mêvan, kire axîn,
Dil û ceger lê dihelîyan
Tu jî roja medan bira
Emê hê bikişînin derd û kula.

-Neke xema îro yanê sibe
Dergê xêrê vebe me hemûya re,
Bona ewladê bava, bav pîra,
Wê bên dengê têl û tembûra.

---

## QELEM XÊJ

Ez mirinê înkar nakim,
Gerdanê stûr bawer nakim,
Çendî hogir, çendî zewal
Min nekirin pirs û hewal.

Çûn roj hatin şev,
Kerîk nan tasek av,
Kesekî min nekir sitar,
Kanê Dîlber, nazik Şebab.

Dilo jaro bes bibêj,
Ba û baranê tev ňavêj,
Birînê dila şax davêj
Him qerim him gêj.

Qurbetîyê welatê sar,
Ez bi têl û tembûr,
Mam qer û lal,
Kesî nekir hewal.

Pêşîya emir kor, kendal in
Benîya mevcût kemal in
Xwe re bikirin nefiroşin
Feqîyê Teyran qelem xêj in.

---

## ÇÎYAYÊ BÎLÎND

Çîyayê bilind mij serî
Kanîyê esîl gulperî.

II

Ridwan xweş rewşa gudan.
Xerîb dost in meth û can.

III

Merîyê kibîr hostayê pîr.
Dê û bava nakin bîr.

IV

Dayika min e gerden xal
Bira gerîyan qer û lal

V

Dayika min e, şîrin şepal
Dayika min e, bejn bal.

VI

Çû nav ax û berê sar,
Ewê girt tope û star.

VII

Derdê xedar tune derman
Wekî hekîm bînî Loqman.

VIII

Merîyê alim û jîr
Feqî Mehmûd nakin bîr.

## NALÎNA FEQÎ

Pencî rojê nûr dibarî,
Dilo nalîn çiqas jar î.

Wesketê min bûne kanî
Gelo benda av jê anî.

Tune hewar tune gazî,
Dilê birîn çi lê dixwazî.

Şeva reş hepsa tarî,
Min kire gazî hezar carî.

Navê teyr min bû çar,
Feqîtî li min bû bar.

Hepsê mîrê decal,
Wêda mam bê heval.

Kesî kilît-mift venekir,
Pirs û hewal min nekir.

Ez derxistim hepsê,
Şandime Samarê sirgunê.

Heyam bê rojê nûr vedin,
Birînê xeda wê kew vedin.

Heps û cîdarê we vebin
Zindan mîra bira serobin bin.

---

## MAWER

Gotin dila bihar,
Zidî dila zihar,
Xewnê şeva nebin bawer,
Horîyê bihiştê tevda mawer.

Gerdenê stûr gotin zara,
Find û fanos koçk û zera,
Şemal nedin hemû cara,
Feqîyê Teyran methê jara.

## DENGÊ FEQÎYÊ TEYRAN

Cimaeta mine ne rihet,
Me ji we hindî minet,
Nivîsarê min hertim wesîyet,
Bixûnin timê xet bi xet.

Wesîyet ji mewcûtê,
Dua ji bangê qudiretê,
Dîndara horîya şibetê,
Destê zorê herim gurbetê.

Dîndara ji metha şebabê,
Deng nayê ji mizgîtê,
Kitêb bimîne hevîya xudê.
Dengê Feqîyê Teyran wê bê...

Xal û xet nimûnin,
Hosta hene feresat in,
Ferman qelpê mîr dihatin,
Hepsêda hene pisê bêgunin.

Min zîndanê pir minet,
Dîwar min bûne kaxêz,
Min nivîsî çendî wesîyet,
Xewa dîharkin silawet.

Kirime hesîrê ruhane,
Ferqût dame ber sokane.
Ne min denge, ne hewal
Kesî pirs nekir ew çi hal.

---

## ZİMAN

Ziman dê ye, ewled lê ye
Welat bav e, hukum navê ye
Bê welat, merî sewî ye.

Dayika min e, ziman delal
Methê kibîr hertim bal
Te kişandin xem û xiyal.

---

DEWLETÎ Û FEQÎYÊ TEYRAN

Bê xem bê xîyal,
Erşa dabê nûra delal,
Gazî kirin feqîyê kal
Pirs kirin çendî siwal.

Dewletîkî beden zihar
Rûniştibû qûre û kubar,
Ji feqî kir çendî hewal
Feqî rûniştibû qer û lal.

-Kîne ehelê cennimê û cinetê,
Îsimî yek navê Xudê,
Ezê bi dimê te qurişê qawê
Bona ewê perde hilanînê.

-Mehmûd Feqîyê Teyra
Rabû ser qudûma
Ebûbet heye boy xuda
Ezê bidim ceba siwala.

Min hewce nîne xezina zêra
Ronayê fend û fenerê
Hertim şemal nadin sera,
Wê bitemirin şimayê çira.

-Didim şahaba kemal rihetî
Orta min û teda tune rastî,
Hinek jor in, hinek jêr in
Hukumê mîra timê zor in.

Cinet û cennime dinîya ronek,
Cinnet ew rewecan têdanin,
Cennime ew sêfîl û jar têdanin,
Mirinê wêda orta meda tene ferqûtek.

## WEFATBÛN

Wefata min bihata cem yekê cabal
Dinê herim bi xem û xiyal.
Ezmana bê dengê MECRÛM-LEYLÊ
Erda bê dengê Ûsib û Zelîxê.

Rica tu kesa nakim?
Qebxatara qir-qir nakim,
Methê dîlbera şebab bikim
Meşqûlê baxê rezê xwe bim.

Navê Mecrûm û Leylê dinê
Methê Ûsib û Zelîxê bê gotinê,
Bira minxin qebxet tîrê janê,
Bikim qale-qal Dîlber canê.

Dinîya gurgu e, lewezê min jar,
Mirin heq e, xemile dîhar,
Emelê xirab, mîrê xedar.
Herim navê ax û berê sar.

---

## TEYRÎM

Teyrim, teyrê bazî,
Bêlana dikim gazî,
dixûnim pir lewezî
Defter kitêb farizî.

Şev û roj hemûya minetin,
Dilên bengîn bilbil şarûr in.
Nexşê cemal sinetin,
Şahîra kemal xet in.

Têl tembûr Mehmûd hewal
Leyle, delal Leyle şepal,
Kanîyê esîl avê zelal,
Feqîyê Teyran qelem şemal.

---

## HA DİBÊJİM

Ba û baran im,
Mij û dûmanim,
Hogirê rîyame,
Dengbêjê fiqarim.

Feqîyê Teyranim
Hebana minda
Nanekî tisî têda
Misqalekê natirsim.

Nav dûmana ezim
Dengbêjê mitheyrim,
Bi qelem defterim
Ha dibêjim û dirêjim.

Mehmûd Feqîyê Teyranim,
Methê sêfîl jarim,
Sazê bike gale-gale,
Sibe me bibe zelal.

Wê wêranbin dengê xedar,
Wê tunebin mîrê zihar,
Wê derê hepsa vebin,
Girtîyê hepsa wê azabin.

Wê bên rojê kibîr
Edî em nabin hêsîr
Ber zulma mîr.
Qelemê bêje min çikir.

## SERÊ SALÊ

Serê salê binê salê,
Xudê bihêle xortê malê,
Tişteki bikin kaşkûla kalê.

Ceh û genim pir bêderê
Feqî hatîye wêderê,
Kaşkûlek dane dewrêşê dinê.

Ewî distira bi têl tembûrê,
Dida methê Feqîyê nûr
Dil duqusand dilî dilî dibûr.

---

## Ê BÊN

Ê bên rojek rojê amindar,
Ê hîşyarbin sêfîl û jar,
Ê qalkin pêşîya mîrê xedar
Ê textê wan bikin wêran.

Hûn bizanbin mîrê xedar,
Ezê ji dinê herim yêkcar,
Lê ew beytê mine zêrîn
Ji dev û lêva nayêne birrîn.

Ewê bikin gujîn û şingîn,
Çawa birûska erşê ezmîn,
Li erda çawa şûrê hêşîn
Wê dilê we bikin birîn.

---

HERÊ BEYTÊ

Herê beytê, beyta minê
Dev û lêv bêyî gotinê
Biçûk, ahil heyetîya dinê
Deng û seda navê mirinê.

Mal û hal milkê dinê,
Yakûd û lal hebûna dinê,
Bezirganê kirrîn û firotanê
Anîne boy qebxetê dîwanê.

Ew lal û durê behagiran,
Ew ne bona sêfîl û jaran,
Helbet, boy sehab rewcanan,
Ne ku bona me hemûyan...

Herê beytê beyta minê,
Tê bimînî rû hewata dinê,
Gelo navê Dîlberê bê gotinê,
Şebab çû ramê xudê zîndanê.

Qelema mine litb û zar
Min nivîsî hertim û hercar,
Min re bûn mikan çar dîwar
Bûme girtîyê mîrê xedar...

Herê beytê, te min wakir
Bezirganê qurbetîyê min karkir
Welat berbi welat birim
Welatê xerîb mihacir kirim.

Herê beytê, beyta min zewal,
Qurbetîyê min kirin çendî hewal,
-Çima hatî vira bê pergal,
Rûniştî rûme qer û lal.

-Li min we erş û ezman
Ezê xeberdim zimanê kurdan
We re nebe zehmet û zîyan,
Biwe xeberdim zimanê Farizan.

Herê, beyta min reng awazî
Mi xeberda erebî û farizî,
Bikim hewar, bikim gazî
Bi zimanê dîya mine kurdî.

We re dibêjim mîrê xayîn:
Winê rokê bikim şîn û girîn
Wê bihedime dîwana mîr Selîm,
Wê me bibin xudan merîyê mitîm.

Feqîyê Teyran qelem cewer,
Xeberê mîra nekin bawer
Xirabkin dîwanê serobin
Bikin rav û tivdîra mezin.

Beyta minê
Beyta minê
Bimînîn dinê
Bêyî gotinê.

---

EXBAL

Wextê bext here ji bale
Xeber bide weke misqale,
Wê bêjin çi dîneki bê kemal e.

Wextê bext bê ser serî,
Bizire mîna kerê nêrî,
Wê bêjin sed aferim, te camêrî.

Wexta exbal bê mû tîn,
Wexta diçe zincîrê diqetîn.
Dilê Feqîyê Teyran kul û birîn.

---

## KİTÊB

Kitebê ya min û teyî,
Miletê min ne ji teyî.

Hebûbet hey boy xudeyî
Bira quran bimîn mizgiteyî.

Ez Kurdim,
Ne tirsonekim.

Miletê Kurd kubarê navê xweva,
Miletê Kurd kubarê qedîmîya xweva,
Miletê Kurd kubarê mêrxasîya xweva,
Miletê Kurd nandarîya xweva.

Feqîyê Teyran ezim kubar,
Nabim hêsîr tu car,
Nexş nimûn bi yar.
Pêşîya mîra bikim şer.

Ritiba xwe nakim betal,
Bejna dota mine delal,
Em mecûrin xudê şadi be
Navê miletê min dinê be.

Min şah û paşa ne min tê
Ne min ters xofa wefatê.

---

## BENDÊ ŞAHÎRA ŞİTAVAN

Bendê şahîra şitavin
Xetê Feqîyê dinavin
Meth û can dinavin.

    Agirê muhbetê dila xêjin,
    Find û fenera stêrik reş in,
    Feqîyê Teyra xet meşûrin.

Hey dota gerdan şebab,
Te dilê minê jar kire kibab,
Te wergirtîyê xac û qumaş,
Kesekî min nekir star.

RO ÇÛ AVA

Ro çû ava tarîyê erd hilda
Qudûm neman çokê minda,
Min re bûn war, zeng û zinar,
Gale-gala avê gelîya bê zar.

Porê reş min sipî bûn,
Bînaya çavê min kêm bûn,
Xewê şeva min bûn bar
Fikirê nisûbet min bûn kar.

Bêjim hewar ezrahîlê neyar
Xwestinê dila bûne zihar,
Sibeyê bê siba nûr hilat
Leylan dila şîrin nebat.

Dewreş min re bûn nas
Ehlîyê qêrî û ne nas
Xêr û xêrata tunebûn libas
Bavê min sexîr Ribas.

Ewrê reş baran û dûman e
Rîya welatê qêrî pêşîya min e
Tune libasek teze li min
Nifirê tene xuda li min.

Ez nakim ax û wan rîya qurbetê
Bira min bidin ber tîrê necarê
Dîsa vegerim cem nazik Dîlberê
Feqîyê Teyra ezim vêderê...

Min dardakin, bidin xeniqandinê,
Bikim gale-gal boy azayê.

Wê bê dewranek ibîr usa
Wê tunebin şah û paşa
Cimaetê bibin hertem aza.

## HEY DÎLBER

Hey dîlberê were ser min,
Dermanê dil tu bide min,
Belkî buxum ez wefatbim,
Ji vî halî başe mirin.

Zîndana Misirê çiqas sar e,
Dilê Feqî sêfîl û jar e.
Şev û roja zare-zar e,
Dil ceger lê hatine xar e.

Li çîyayê hebin gul û rihan
Bilbilê hêlûna bivne mêvan,
Lê dîlbera, ez bi heyran,
Ê tunebe Feqîyê Teyran.

Dil kovan e, dilî jan,
Çiqas hakîma bînin,
Çiqas dermana binîn
Ew dila nakin derman.

Derman ew e destê Dîlberê
Ax û kesera li dinê,
Destê xwe bide ser birînê
Wefat bim herim vê dinê.

---

## PADŞAHÊ ERŞA

Padşahî erşa, dêye ezman.
Çîyayê bilind serî dûman.
Xam û xiyal, şevê bê guman.
Dilê şikestî tune derman.

Methê dila evîn baristan,
Bengizê gula çayîr û çîman,
Bêlanê bilind wer zozan,
Avên kanîya û rewşên wan,

---

## BEYTA MİN

Heylê beytê, beyta minê,
Mal û hal tacê minê,
Heta ku hene axirîya dinê,
Tuyê zaravî bêyî gotinê.

Hey Dîlberê, zeman zeman,
Li gotina min bibe xudan,
Tu tucara nava poşman,
Bêjim ezim, Feqîyê Teyran.

Hey Dîlberê, ê bên dewran,
Ê tunebin mîr û xudan,
Têke axîn ne jî ewana,
Navê minê bive beyan.

Gulê rabin mêrg û çîman
Ewrê reş betavebin sero bin,
Wê tunebin mîr û xudan
Wê bikenin gul û rihan.

Xemê dilan bibin baristan
Wê bên şahîrê dil û can.
Nakin nal-nal ber tîrê jan,
Gelo, bîr bînin Feqîyê Teyran?

---

## XEDARA HAKÎM BOŞ

Aqila kemal,
Qismeta mal,
Metha şemal,
Feqî bê mal.

Coca mekin xuroc
Bêlana çendî beroş
Emir bikir, mefiroş
Xedara hakîm boş.

---

## MİKİS XWEŞ WETEN

Mikis xweş wetan,
Xemla gula piltan,
Bihar havîn li te zozan,
Çîyayê bilind methê wan.

Mêrg û çîman dilî baristan
Wê hêşînbin sosin û rihan
Bûme kalekî bê guman,
Mihacir Feqîyê Teyran.

Cimaeṭa min kanîyê esîl
Wê bikişe hertim zelal
Heta hebe rewinaq û şemal.

Herim gundê bavî xweyî kal,
Cem dayika xweyî bejin û bal,
Ew çûne nava ax û berê sar
Wana jî silav daye yekê cebar.

Hey malim xirab
Bûm kalekî bê pergal.

Rewnaq: roj, cems, tav

---

## LİTB

Litbê şîrin zarin,
Bedenê reş ewledin,
Mêrên zor nefiroşin.

Bendê emir zewalin
Pêşîyê kor û kendal in
Têda çûyî û kemal in.

Rîya min çiqas dûr,
Metha dila çi nûr,
Bendê Feqîyê Teyran kûr.

## DEWSA TÎRA

Dewsa tîra xweşdibin
Dewsa xebera xweşnabin,
Mirîyê gora ranabin,
Emelê xirab çênabin.

Emelê xirab destê mîra,
Feqîyê Teyran kete çola,
Dîlberê kire axîn şev-roja,
Ew jî bû mêvan ax û ferşa.

Tîrê dijar dilê mindan,
Serê tîra hewqa çûne xarda,
Kire axîn çîya û banîya,
Kewgirîn ew jî halê minda.

Min nivîsîn bendê şahîra
Pir û hindek ser kaxêza
Dinya gurge ecel pey tê
Ku hat ecel nade mecal.

## AXÎNA FEQÎ

Çima axîn te tê, kûvîya min delûl,
Destê neçîrvanê decal bûyî melûl,
Dengê nalîna te tê kûr û zelûl.

Rojgara we jî ya min
Birîna te weko ya min,
Ax û keserê te ya min.

Terq û bûyî ji mirina mîra
Pêlît û nar cura dila
Axîn tê ji Feqîyê Teyran.

## HÊSİR PARA TÊYE

Hêsir para têye,
Şûr ya bavêye
Mehmûd Feqîyê Teyra ye.

Xizmet hey boy xudêye,
Methê dila dil dibêye,
Ne rîya mirinê pêşîya me ye.

Bê şer silavê bidim Dîlberê
Renga min welatê Ecem
Bira wefatbim wetenekî dinê.

Navê hertim bê gotinê
Herge vira, yanê gurbetê
Nakim fikar ji xeniqandinê.

Wê bên rojê qence kibîr.
Hêsîr nabin ber tîrê dijar.
Cimaetê nabe zidî sexîr.

## KANÊ

Kanê mawer, kanê Zihar,
Kanê Leyla Mehmûd yar,
Silav dane ax û berê sar.

Dilo werê neke nalîn,
Erş û ezman te kewgirîn
Beybû sosin mêrga reş in.

Hêsirê min bûn cew û kanî,
Muhbetê dila av jê anîn
Feqîyê Teyra, wext bihirîn.

## HETA BÊ

Heta bê sewta mîrê decal,
Ezê hepsêda bikim gal-gal,
Ez Feqîyê Teyranim nakim nal-nal.

Find û fanos şemal in,
Dîwana mîrda neyar in
Qelema min wan zihar in.

Kirinên mîr pir xedar in,
Zîndan bona nevsê jar in,
Ez mirina nakim fikar.

Wê bên û herin qurne û bedîl,
Ber zulmê nabin hêsîr û dîl,
Mera wê vebe dergekî kibîr.

Ezê rêzkim nexş û nimûn,
Ser kaxeza bi qelema zêrîn,
Nakim axîn ber zelfê wan.

---

## METHÊ DOTÊ

Heta herim ber wefatê
Agirê hubê ku pir pêtê
Ezê bidim methê dotê.

Kirîamet heye boy xudê
Dengê bên ji hed-sedê
Bendê şahîra ser kaxizê.

Agirê qiyametê dû me tê
Dengê Feqî nayê mizgîtê.
Bira kitêb bimîne hêvîya xudê.

---

## DÎNYA HEYE

Dinya heye û dimîne,
Dinya tijî û defîne.
Alîk şahî ye, alîk şîn e,
Axirîya merîya mirin e.

Babax nebe mîrê dest qirêj,
Ew hepsê we yî binerde xêj,
Çiqa çiqa merîya kirin nimêj,
Nedîtin azaya dil avêj.

Mirin ku heye, ew erhedeyî,
Şîn û girî ritba dinya yî.
Ba û baran heyatîya tebîyetêyî,
Feqîyê Teyra hogrê, feqîr-fiqarayî.

Qenc ew mirinê nekin bîr
Kanê xelqê alim û jîr,
Ew ber mirinê dibûne hêsîr,
Ew ji çûne dîndara yekê kibîr.

---

## XUZLA NEHATA

Xuzila nehata bayê Semerê,
Lênexista bêjin bala Dîlberê.
Ewter nebit dêm qemerê,
Herê lê, herê Dîlberê.

Quling bihatina ji Berîyê,
Banîya baharîk ji dîlberê,
Derd, kul çi kêderê
Herê lê herê Dîlberê,

Qulingo, Eceleyî li Ezmana,
Per û bask herî zozana,
Dîlber bêje erê, nebê na..
Herê lê, herê Dîlberê.

---

## AQÎLÊ SÎVÎK

Aqilê sivik, barê giran,
Aqilê giran, barê sivik.
Aqil tacê zêrîne
Serê hemû kesîda tunîne.

Wexta bext bê mûtîn,
Wexta diçe zincarê diqetîn,
Ziman şîrin mara qula dertîn,
Mewcûtê tam, tacê zêrîn.

Dilê Feqîyê Teyra birîn
Şev û roja, şîn û girîn
Rîya xerîbîyê, mij û dûman,
Ew hukumê mîr Terxan.

Birînê dilê min xedar in,
Hakîm nakin tu çar in,
Pêlît dîrek huba narin,
Hildî, xedarin hindî dijar in.

---

## BÎR NAKÎM EWÎ XORTÎ

Bîr nâkim ewî xortî
Ku min re kir hogirtî,
Çavên reş birû fêzê
Silav min kir nolî bazê.

Rêwî qurbetê gerden niqsî
Rêwîyê qurbetê gerden niqsî
Keser lêvê, bêjn û balê
Feqîyê Teyra mihacirê çolê.

---

## HEY FELEKÊ

Hey felekê dilê min kulkir.
Derd û bela min pir kir.
Nolî bilbil bizarim ez,
Şibeta mûmê bihelim ez.

Nizanim çi bêjim vî dilî
Pêlît û nûr tijî,
Him digirî him dibêjî,
Bedîl qet halê min napirsî.

-Bijî ademo, em bi cotin
Sibhan şahên xuroşin.
Emê hin dikirin him difroşin,
Mehbûb dila hertim cotin.

-Avek ava kanîya Tehûrê
Min vexwar weke şerbeta nûrê,
Ku tên ji zozanê min
Hênik dike baristana dilê min.

-Ezê tasa avê hildim deste,
Destekî te re têxime kemberbeste.
Kilît mifta hilde deste
Perda veke te re destûre.

---

## DILÊ BIRÎN

Dilê birîn,
Dilî kîn,
Bû hogir,
Rîya dûr,
Bayê kelamper
Rîya qurbetê ber,
Feqîyê Teyra ezim,
Maşoqê baxê xum.

Nûr-nedera minê
Ba û baran rabe dinê
Tu îtqata rabe dinê
Tu îtqata minê,
Hey Dîlber canê.

---

EMÎR

Her lazime emirê dirêj,
Malê dinê li destê qirêj,
Wexta ez mirim edî mebêj.

Bi emirê xwe re bibe xîret,
Meke şuxulê bê cumlet,
Heta te tê bike sobet.

Her emirê xwe bicerbîne,
Bade devê xwe meşhitîne,
Dîndara qîyametê xwe nebîne.

Emrê xwe re, xweyî dîndar ,
Tîra neheq ew xedar e,
Bext li emirê merîya sîyar e.

Emirê dirêj ez disotî,
Ew beytokê min digotî,
Cizîrîne tevda botî.

Pey emirê xirab mekeve
Tu hey bide jê bireve.
Mirina merîya ase ev e.

---

ROJÊ ECEL E

Rojê ecel hemîn ser e,
Emirê ku çû venegere,
Hêsirê min bûne cew kanî,
Bende neman av jê anî.

Herça dike ew mîr dike,
Derd û bela tivdîr dike,
Daxim li xelqê pir dike.

Lê bi zanebê xwe re xîretê
Bibe gula dîndar şîretê,
Emel ewe te re misretê.

Derbazbûne sal û zeman,
Zef gotina bûme guman,
Ewlî û perî jî neman.

Min sêwrand emirê xweda,
Ew qinyatê şahîr benda,
Alim rabûn pesî vedan.

Alim xwe li misretê,
Gilîyá çêke ji tebiyetî,
Şuxul ewe kêrî te tê.

## FEQÎYÊ TEYRAN Û CÎNARTÎ

Tirba mine li ser kanîyê,
Hêsr têne ji bin eniyê.
Bîr nekin qedrê cîranîyê.

Ew cînartîya şîrin bestî,
Nayê nêzîkî hemû destî,
Mîrata cînêr ji cînêr xwestî.

Ew qedrekî zef şîrine,
Gere merî her bîr bîne,
Cînartîya şîrin bihebîne.

Cînartî heye bera dila,
Ew çêtire ji bav û bira,
Ji qencîyê tê bîna gula.

Tê gotinê li rû dinê,
Cînar cînêra dibe xinê,
Ew yek nayê qet bîrkirinê.

Cînartîya şîrine gele delal,
Ew zef çêtire ji birê helal,
Merî rû dinê nave ewgar.

Tirba min vî dibûrî,
Seva min cînar mirûzkirî,
Şîna min dike, her digirî.

Birê min zef in derekene,
Ewan haj min tunene,
Cînar min re sinadane.

Cînar baş in usa heval,
Pakîya min re dibe ewgel,

Saxîyêda min dihêvşînin,
Mirinêda min dikefinin,
Birên min jî haj pê dînin.

Kî min dihebîne eşqa dila,
Ewe min re bav û bira,
Bona min bikisînin derd bela.

Tirba mine berbi ro ye,
Cînar birê minî hero ye,
Ew qeweta, him jî çê ye.

---

## DÊ Û BAV

Hergav. herro hemû gava,
Lazime qedirê dê û bava,
Wek muhbeta herdu çava.

Heta ji emr bibî pîr,
Bîr meke dayikê û şîr,
Tu navînî gilî texsîr.

Wekî bibî tî û birçî,
Qe bîr meke şîrê sipî,
Qelp qinîyaz her bineci.

Dayka pîre dilbarîne,
Te şîrê helal dimêjîne,
Nav bêşîkê te dihêjîne.

Weke wî şîrê helal,
Tu xweykirî wî bavê kal,
Emekê wana meke betal.

Qedrê dê û bava bizan,
Nav dinyayê nebe nezan,
Xwe re hilde şîreta han.

---

BİRÎNÊ XEDAR

Miriyê gora ranabin
Emelê xirab çênabin,
Birînê xedar çarnabin
Dilê Feqî pêlît-nar in.

Sond û silavet baqê gulan,
Hindî bawer, hindî hewal in.
Bazirganê mirinê pir giran,
Emê axê bibin taristan.

Şîn û şayî dinê ranabin,
Horî û pêrî axê tuabin,
Xêr û xezne kesî re namînin
Bazirganê mirinê girîn...

Dinya xan e, xan bi tijî
Bazirganê mirin hate xercî,
Hinek dimirin hinek dijîn,
Xem û xeyal bê feydeyî.

Rewneq ranabe dinêyî
Dinya boş e bê fêdeyî
Mirin heye erhede ye
Tebîyet qanûn û qeydeyî.

---

WESÎYETÊ TEBÎYETÊ

Hezar siwalî dinê siwarbi,
Mîrê şerq û Şambû,
Kasa mirinê tuyabî.

Hezar siwalî dinê patşihabî,
Xweyê gurz û kemendabî,
Rokê tê ber fena mirinê bî.

Hezar siwalî dinê saxbî,
Bi zêr û dirafa xinê bî,
Tê rokê mêvanê axêbî.

Hezar siwalî dinê bazirganbî,
Yaxûd û lal firoşibî,
Tê rokê rêwîyê mirinêbî.

Hezar siwalî dinê yarbî,
Gerden tijî morî-mercanbî.
Tê rokê xemila mexberbî.

Hezar siwalî dinê geştêbî
Hizkirîya meth û xudabî,
Tê rokê şîrin axê tuyabî.

Hezar siwalî dinê hurbî
Teqalê Silêmanê bi morbî
Tê rokê bazirganê goristînbî.

Hezar siwalî dinê şemalbî
Xudanê milk sensenatabî
Axir-oxir mirin me re hebî.

## AVÊ

Herê avê, herê avê,
Bes e pêlê zirav bavê,
Şev û roj dikişî bê pêlavê,
Pêla paşîn davê tîra navê.

Te ne serîye ne çav e,
Kanîya esîl sûlav, av e,
Ne te dê ye ne jî bav e,
Emirê Feqî ma gerêva.

Bilqîz derketibû zozana
Deng te xweş ora ava,
Ew denge çi xweş deng
Xweşîna vî dengî ne tu reng.

Feqîyê Teyran got-
Herê şaxê, herê şaxê
Kember zêrê li nav tengê
Heçka ku hazir nake
Cem te Feqî ne pak e...?

---

## BÊJN Û BAL

Bêjn û bal ne para hemîyan,
Xwarin û vexwarin para hemîyan,
Xwestin,bihara dilan,
Mesele ya Feqîyê Teyran.

Kê werdigire etlez qumaşin?
Ew rawecan, mîr û hakim in,
Zêr û zîv wana ciman
Kirrîn û firotin destê wan.

Qismet nanek hebana mindan,
Nahêlin herim serê sifirêyî jorîn
Cêva meda tune dirafê qawekê.
Kê wê bide meda rehelê dinê.

---

PESÎN

Sond û silav in
Bejna zirav in
Dêm gulav in.

Avê kanîya sar in,
Nûr neder nav in,
Porê sipî qirav in.

Gerdenê stûr nepesinin,
Diraf desta qirêj in
Nadir, guhar boş in.

Dewran dor in,
Dewran zor in,
Mîr xedar in.

Hukmê mîra zor in,
Pêlît û gerdûn in,
Zarê wan zihar in.

Hinek jor in,
Hinek jêr in,
Hukum zor in.
Bona nevsê jar in.

Mirîyê gora ranabin
Emelê xirab çênabin
Gazin lome bêkêrin.

Şîn û girî hizin dilan,
Def û meyter bê feyden
Îro koç û bar in
Sibê mal û war in.

---

## GÊLAVÎYÊ

Hatîyê qasidê çîyane,
Were bike xeberane,
Serê rê me birrîyane.

Hatîye qasidê derda,
Soranîke sor berda,
Reşxeteke reşe serda.

Hatîye qasidê zêye,
Reşxetek Gêlavîya min lê ye,
Nixuteke jerê tê ye.

Ezê wê reşxetê dixûnim,
Tî pak tê nabînim,
Davêjim, pişta xwe didim,
Berê xwe tê diguhêzim.

Herê mîrê esil nexas,
Tu bajo here bi nas,
Tirba xerîba bike nas.

Meli-hafa goristîn
Min pirskirîye dergevîn,
Gelo, xelqê xerîb kîn.

Min hafa goristanî
Min pirskir dergevanî,
Merzelê xerîba kîjan.

Merzelê xerîba min her ewlin,
Sed heyfa min tê çav û birya
Teye dêmê gulî,
Ew jî çûn ax û berê tarî.

Sed heyfa min tê wê gerden dirana,
Wan morîya, wan mircana,
Ew jî çûne ax û ber goristana.

Derê Tirbê min hil dike
Min Têda bidîTa
çav belek, bazin û zende,
sed heyf axêda dirize

Derê Tirbê li min birrîn,
Min Têda bidîTa çav û birûyê narîn,
Belek dêmê durîn,
Gêlavîya min ax serda reng gulirîn.

Derê Tirbê min vekir,
Gêlavîyê axên minakir,
Reng gulirî min nazekir.
Min sê cara deyn lêkir,
Gêlavîyê ax û ber sarda,
Xeyîdiye gulidar min nekir.
Qudiret yekê remanî
Gul nayê desT ûpîyanî
Gêlavî rab rûnî,
Jê bikim xeberdanî.
Min goT- herê Gêlavîyê, sulinê,
were bêje min goTinê,
Çika çi hewalêTe mirinê.
Gêlavîyê goT- herê Feqîyo
Min nava zîr û zîv dibare
Ewana daye minda Kasek jare.
- Herê Feqîyo Hîjde şevê havînê.
neliaT ser min Lêzimeke xûnê.
Herê Feqîyo hîjdeh şevê havînê jimare,
Min ne Kirrîye, ne jî xwerî ye,
cavê min hêsirav dibarîye.

Feqîyê Teyran dibêje-
Xuzil tu bihatayî kirrînê
Minê xetê zêrîn têxira mêzînê,
Qey xatirê dil evînîyê.

Gêlavîyê got:- Herê, bira tî xweşbî,
Sor guleke nava gula geşbî,
Bira cîyê min ax û ferşbî.

Gêlavîyê got:- Herê, biratî saxbî
Bira tu gulek-gula baxabî,
Bira cîyê min xulî û axbî.

Gêlavîyê got:- Hizkirna me dila
Ezê herim ji rû erda.
Bira tu bimînî her dera.

Berê hali ser bera
Xuda undanekira çavê reşbeleka
Xirab nekira xweş nedera.

Herê berê, di ser bera sêkkana
Tê xweda pûçnekî metha dila
Ezê vegerim bû huba dila.

Xasê ji nav nasa.
Huba dila çûye, edî nayê
Mirin heq e para nayê.

---

## BENDÊ SOBETÎ

Ezê tabûtekê çêkim bi dar,
Navda razê yanga çav xumar,
Ew jî çûne nav ax û berê sar.

Çûme mêrgê şewlek bi dest,
Belgê şewlê zêr û dirafê kesk,
Ez Feqîyê Teyranbûm tembûr bi dest,
Min mêrgê nekire qest.

Çûme mêrga şewl di nav,
belgê şewlê zêr û dirav.
Ez miskîn bûm neçûme nav.

Lo lo dilo yartîyê neke
Qelpê dilê xwe xirab neke,
Xwe ba yar û bira rûreş neke.

Lo lo dilo teyrê bê cî,
Tu pey jina mêr neçî,
Gelek aşiq bûne şeqî.

Lo lo dilo teyrê bê mal,
Tu pey jinê mêr menal.
Gelek aşiq'çûn ew heval.

Lo lo dilo şayê merda,
Çavkanînka av lê berda,
Derd û derman herdu jî têda.

Lo lo dilo, şayê mezin
Çavkanîbûn av lê dibezin,
Derd û derman te da min,
Feqîyê Teyra çola xistin.

Sed salî dinê xebatkî
Mîrtîya Misirê hetanî Şam bikî,
Tê rojekê kasa mirinê tam bikî.

Kanê mûsayê minî delal
Kanê Zelîxa xêlî û spîyal,
Ew jî çûne ax û berê sar.

Kanê Ûsibê minî aqûb
Kanê Zelîxa zere mahûb
Ewana axêda girtî texûb.

Ka Ûsibê minî vê wesbetê,
Ku Zelîxa mal zêr û xetê,
Ew jî çûne ber wê usfetê.

Kanê Silêmanê hukum dikir,
Kanê Bilqîzara nav bikir,
Ewana jî çûn dinê terkkir.

Kanê Silêmanê hukum dikir çendî dinê,
Kanê Bilqîzara mal zêr xinê,
Ew jî çûne ber wê fenê mirinê.

Kanê Silêmanê hukum çendî teyar,
Ka Bilqîzara xêlî û spîçal
Ew jî çûne nav ax û berê sar.

Ezê tabûtekê çêkim bira webî
Navda razaye yanga çav erebî
Ewana jî zanibû mirin hebî.

-----

## BEXT MERÎYA SÎYAR

Çi bazirganekî baş e,
Serbar, binbar qomaş e,
Xozila min wî bê,
Erzan bikire, biha nefiroşe.

Bext merîya sîyar e,
Wexta serî çû aqil e,
Kesî re ne hogir e, ne heval e,
Mîra nakim silave.

Heqî destê neheqada bar-bar e,
Xizan destê hurada zare-zar e
Feqîyê Teyra bi têl û tembûre
Ximsê dila çiqas dûr e.

Ew hukumê mîrê xedar,
Destda kilît û niştar,
Kê wê seke dengê feqîr,
Çiqas hepsêda bikî hewar.

Hezar salî saxbî dinêbî,
Bi zêr û zîv xinêyî,
Tê rokê mêvanê qebirêbî,

Benîyo nebe tima
Bi zêr û zîv nebe cila
Dinya mal û bê hal im
Derd û kulara dinalim.

ŞEBAB

Dêmê reng û keleş,
Roja nedîr xweş,
Çemişê di reş.
Beden şemala geş.

Şebab nar,
Şebab bar,
Şebab yar,
Şebab zihar.

Dilê birîn
Benîya girîn,
Roj bihurîn,
Porê sipî axîn.

Gul û sosin tev bihar in,
Rêya qurbetîyê bona jaran in,
Nexş ed Feqîyê Teyran
Axır, oxir axê tuyan.

Hetan roja dengê wefatê,
Kesek kemal wê culetê,
Axîn, ofîn Şebabê tê.
Ferwar Şêxê bejinê tê.

Ferwara Şaxê batinî
Xozilê denge min vekra,
Qem û qanatê dotê bidîta,
Nazik Şebab bihata qudretê.

## FEQÎYÊ ŞÎRİN DELAL

Feqîyê şîrin, delal,
Dîlberê re kire gal-gal
epsêda mam bê hewal,
Xafilqêda, hukimî dila.

Kanê Leyla şepal
Kanê Mecirûm delal
Kanê Ûsibê Kilhanî
Mexberda girtin îman.
Emê rokê herin wî alî,
Bendo mirin heqê me yî,
Qor û kefen mala me yî,
Ax û wax bê fêde yî.

---

## KARİK NAMÎNİN BİN SELİKA

Karik namînin bin selika
Wê rojek derkevin meydana şera,
Wê bên rojê dengê aza,
Ew e, gotina Feqîyê Teyra.

Cimaet timê namînin tengezar
Wê hildin tîr û kevan binar,
Wê biqetînin qeyd û çîdar.
Wêran bikin hepsa mîrî zihar.

Ezê qelem û defterê xwe daynim
Ezê tev we şûr û mertala hildînin
Bona wetenê bavê xwe şer bikim,
Zimanê dayka xwe zîyaretî xweykim.

---

## DEWÊ MEŞKÊ

Kil, ha kil, dewê meşkê
Kevaniya malê stukur bişkê,
Kanê rûnê girtîye meşkê,
Hinek nihîşt bona teştê.

Kil ha, kil, dewê kûpka
Rûn xwar, dew da bûka,
Qet tewaş tunebû têda,
Tiştek neda destê biçûka.

Kil ha, kil, dew nabe
Kevanî raza xewê ranabe
Navê wê heye Hinar e
Bûk birçîya kirîn dar e.

Kevanîya malê bêpergal e,
Ew jina Mehmûdâ kal e,
Bûka kirin zar zare,
Navik lêye Dîdar e.

---

## MÎN KÎRE AXÎN

Min kire axîn,
Min kire nalîn,
Dilê min birîn,
Tune derman, hekîm

Feqîyê Teyran ez im,
Dilê xedar hekîm ez im,
Rêya qurbetî hogir ez im.

Bûme hevalê revîya
Nanekî tisî hebanêda
Kerîk min da hogira.

Şev û roj em dibirin
Hewce me ne dikirin,
Çîya û banîya re derkirin.

## WERÊ BÎ NAR

Werê bi nar,
Şerk bi zar,
Şemal mawer
Dilê bawer.

Gerden zer karbar
Çavê reş xumar.
Xatûna dêm keleş,
Tîra nek dilê nexweş.

Ezim hogir
Tuyî nedîr,
Gul-bihar,
Tuyî teyar.

Ezim jar
Bikim hewar.
Meth û yar,
Zêr û guhar.

## RİHAN

Navê dostê Rihan
Kilên çava piltan
Devek wê bi ken
Ew mereza xortan.

Kanîya dila dildan.
Ew kilîtê pêdan,
Xorta vekir ziman
Bejna bal Rihan.

Sibe ye, sibe nabe,
Gul biçivî venabe,
Tewret xewê ranabe

Husilcemal bejna delal,
Xewên şeva min bûne betal,
Stêrkê ezmana bûne şemal.
Ezim hizreta dêmê bixal.

Lewzê delal ritib şîrin.
Xwezila te re bibûma heval,
Tu milhema dilê xedar.
Rabe xewê horîya kubar.

Ez kalnabim qet tucar,
Huba dila nakim betal,
Gul mêrga nabin xedar,
Ava kanîyê nabin zihar.

## FESİL

Di fesla nav biharê,
Digel Dîlber biçin geştê.

Ji xweştir umir nabitê,
Li min ew hal qewîm xweş tê.

Di fesla meha gulanê
Digel Dîlber lî seyranê.

Di ew xweştir nabitê,
Bi ayeta quranê.

Di fesla meha şibatê
Digel Dîlber li cibatê.

Ji ew xweştir umir nabitê
Bi ayeta vê tewretê.

---

## PÊLÎT

Me ji we nimûn
Agirê dilê Mecnûn,
Methê Leylê xatûn.

Ji min we minet
Bêjin min wesîyet
Bidin pirsa rast.

Mîna mecnûn ji çola,
Min vexwarin avên gola,
We ku nara pêlît dila.

Xew nayê şev û roja,
Dilê Feqî agirê beroşa
Bûme firarê şah û paşa.

---

## HEY GULBÎHAR

Hey gulbihara xet û xal,
Methê dila kirin bê pergal
Bejn û bal gerden şephal
Ji stêreka çêkim yaxûd û lal.

Ax gulbihara meth û xiyal
Zendê dizer, zêr û xirxal
Mehbûb dila kanîya zelal
Rext û rişma beden kemal.

Hezar dilî xem û xiyal
Hezar litbî bikim gale gal
Kanê, ku ye horîya meth bal
Deng nayê ji dêmê şemal.

Hey gulbihara xet û xal,
Rûniştî kîsa qer û lal
Çima min re nakî qale gal
Feqîyê Teyran dilî zewal.

## FEQÎYÊ TEYRAN Û DUR

Muhbeta dila dur e
Aqil ew e, jê bikire,
Wekî bende jê vegere.

Ew dura zêr zêdetir,
Navda hene gilî xeber,
Heta te tê jê bikir.

Ew dura sek sukan e,
Li destê Feqîyê Teyran e,
Gel ji wê tê xeberdan e.

Her camêr bî tê bikirî,
Gelek xwe re bikî û bifikirî
Tê jî wê rojkê bimirî.

Ew dur heye huşirxan e,
Qurna misheb ew navda ne,
Devk lazime zikirxan e.

Bikir xwe re dura meşûr,
He bifikirî zanebûna kûr
Li dinê Feqîyê Teyran xe[illegible]ûr.

TEBÎYET

Meya tijî gulav in
Methê dila silav in,
Gerdenî xedî binav in.

Mêrê bi mor wefabin,
Dinya bigirî ew ranabin,
Bengizê zulmê pak nabin.

Mêrên bimor,
Mêrê bi zor,
Wefatbin dor.

Bayê mirinê tofan rabe
Tebîyet bi xwe sek sêkan e
Mirin teva mêvan e,
Wext merîya Kawran e.

Dendik dinê zêde nebû,
Nuxtek avê nebû,
Berê mezin çênebû,
Axir, oxir mirin hebû.

BÎHARA XÊRÊ

Xêr bê bihara havînê
Xuşîn bikeve avê zelal
Pê hêsabin dilên jar.

Xêr bê bihara xêreyî
Rewnaq bêye rû dinêyî,
Cebirek bikeve rû erdeyî.

Bende lê bikin çandinîyê
Bona Îdara dinê ye,
Rojê salê ebûr pêyo.

Xêr bê bihara pey havînê,
Ew çi mehên del û dînin e,
Xewê ji benîya distînine,
Îdara donzdeh meha sê meha dibînine.

Hêr bê havîn, pey payîzê,
Ew çi mehene pir ezîz in
Dilê benda têda zîz in
Di gire çîya û banîyane
Di gire derî û kulekane.

Ronahî

## BÎHARA NÛR

Ax, bihara nûr û nedar,
Beybûn rihan hatin der,
Avên kanîya esîl sar
Misk û mawer tên xwar.

Dilê bengî kanîyê zelal
Şev û roj dikî gale-gal,
Hem û xiyal dilê jar,
Gerdûn pêlît û nar.

Xew nayên li bana,
Emê di herin zozana,
Avê vexwun li kanîya,
Ax û keser Feqîyê Teyran.

---

## TEYR BÛ TEYRÊ BAZÎ

Teyr bû, teyrê bazî
Hêlana min kir gazî,
Pencê rojê nûr dibarî,
Hezar dilî hezar carî.
Wesîyetê min bûne kanî
Kê çiqasa av jê anî...?
Tune hewar, tune gazî
Bûme mêvanê zîndana zirî.
Ew çêbûye bo sêfîl û jara,
Ne xof, ne girî Feqîyê Teyra.
Girîn bona dayikêyî
Sebir nuxta mêra.

---

## DÎLBERA HORÎ

Ji rengê Dîlbera horî,
Dilê min tîrek lêda,
Zerîfa ling liha morî,
Minewar bû di gurêda.

Minewar bû weku kurê
Kemend dabû li ser şûrê,
Ji rengê Dîlbera horî,
Dilê min tîrek lêda.

Dilê minda tîrek dijwar.
Serê tîrê di dil çû xar,
Heya kengî bikim hewar,
Weke Mecnûn di deştêda.

Weke Mecnûn bimînim ez,
Şibhê bilbil bixwînim ez
Heya kengî bimînim ez
Di zindan û di hepsêda.

Ez mame di zindanê
Weke Ûsif li Kananê,
Gelo Dîlber li min kanê,
Min çav mabû di wê rêda

Min çav mabû dilo hey l[illegible],
Dikim hewar û weyleylay[illegible],
Ku carek der bêje Leylê
Bibînim bejn û bala yê.

Bibînim bejn û balaye
Şepal û şenga Leylayê
Dixwim sonda vê telayê,
Kirime exsîr di vê sihe[illegible]ê.

## DÎLBERA FEQÎ

Wey, horîya sûret goş e,
Çavê belek weke roj e,
Bese emrê min bihuruje,
Ez motacê bejna tem e.

Li bejna te mame tima,
Ji kerba helîyam çewa çima,
Emrê pir çû, ê hindik ma,
Ez motacê bejna tem e.

Wey, Dîlbera gerden gazî
Li enîya kever zêrê zerî,
Boy te dikim hewar gazî,
Ez motacê bejna tem e...

Wey, horînga li teyatê,
Wey mehbûba dilê min ketê,
Weke zêr nav kaxetê,
Ez motacê bejna tem e.

Wey, Dîlbera dur guharê
Şemala bang û qezayê,
Bedewê weke Bilqîzayê,
Ez motacê bejna tem e.

Wey, Dîlbera qutfa dinê
Sûretê sor xal ketinê
Ez ketime halê mirinê,
Ez motacê bejna tem e.

Wey, Dîlbera, demê gulî,
Mîna horîya dimilmilî,
Ez maşoqê te wî dilî,
Ez motacê bejna tem e.

Wey, Dîlbera, bejn ziravî,
Wey, nazika sor gulavî,
Hebî li Feqîyê Teyran şabî,
Ez motacê bejna tem e.

Wey Dîlbera qamat temam,
Di hepsêda hêvîya te mam,
Derbaz bûn wade û qam,
Ez motacê bejna tem e.

Wey, Dîlbera reng sihanî,
Weke hîva li rû ezmanî,
Şewqê didî çîya û banî,
Ez motacê bejna tem e.

---

## XEDAR

Kanê Pêrîşana nedîhar,
Minda tîrek xedar,
Tîre biçûk dilda çû xar,
Xeber neda dilî dijwar.

Dilê min bû kerî kerî,
Şibeta ewrê reş û tarî
Ser minda hûr dibarî
Derd û derman tu nedîrî.

Bilbila nekirin qale-qal,
Nebûne maşoqê gul xal,
Gul biçivîn reng tehîrîn,
Serê xwe mêlkirin hev nihêrîn.

Birîna dilê min xedar e
Hekîm nakin tu çare,
Pêlîta hubê dîrek nar e
Him keder, him bihar e.

---

## HEY GUL

Hey gul, hey gul
Te bengîkirin dil,
Xem û xiyal bilbil.

Sor û zer tuyî xemla çîya,
Bîvedeyî hemû cîya,
Îtqat ew methê bengîya.

Çîyayî bilind avê sar
Deng dane hev tên xar,
Ax û keser dilê jar.

Hel gul, hel gul,
Te bengînkirin dil
Xem û xiyal bilbil.

Min van çîyan kir gal-gal,
Min pir da methê sura dil,
Şibêta şarûr û bilbil,
Mam bê yar bê dil...

Li zozana çîyayê bilind,
Min stira tembûr û zar,
Xewê şeva dota kir bar,
Dilê bengîya tijî nar.

Gul, sosin, rihanê çîya.
Qevz, qevz tanîn xorta,
Boy qîzê bin darika,
Bi qevzê gula kêf xweş bûna.

Xozil wadê zozanê
Gul dikenîyan demê
Distiran qîz, xortan hingê,
Ez cahil bûm nava komê.

Feqîyê Teyran derdê keserê,
Bihar,payîz methê yarê
Tên xuş-xuş ava xuşarê.

## BAYÊ FELEKÊ

Bayê felekê me dewran,
Nayê dota mine guman
Tune heta axir û zeman.

Qurbetîyê û welatê dûr
Meth û can dota nûr
Dilî birîn derba şûr.

Dike axîn şibêta min,
Xem û xiyal reng momin,
Pêlît û nar dila hêzin,

Dilê xedar tevda birîn
Tirbê rakin hekîm Loqman
Birînê xedar nakin derman

Deng û seda ji qudretê
Em hogir in rêwîyê tebîyetê
Agirê qîyametê ne dumetê.

Sêkin be bayê axira dewrê
Emê silavê bidin qebirê
Feqîyê Teyran methê surê.

Ew gotina min tebe
Hizreta dil kovan be
Axîn, girî min û te be.

Ronahî

## MİNMİNÎK

Minminîkê hêz û zer,
Reng û rewaz per
Kulîlka radimûsî ger.

Per û bask awaz-awaz
Ser kulîlka bûyî baz
Tev nekin, şandilxaz.

Digerî çayîr çîmana lez
Minminîka min e çav qewaz
Gul û beybûn motac bez.

Ez te dinhêrim bûme dengbêj
Te ez kirim k'or û gêj.
Digerî kulîlka her roj.

Nav kulîlka xweş digerî
Di per û bask tu hêsa nabî.
Qet natebitî rihet nabî.

Te maşoqin tenê ez,
Te hiz dikin, xort û qîz,
Perê te şîn û gevez

Feqî bûye maşoqê dota ellez,
Bi têl û tembûr û saz,
Digere nava bax û rez.

MÊVAN

Gundê Bihadê bûme mêvan,
Xerîb dostbûn miletê wan.
Bihar, havîn li wir zozan
Çîyayê bilind serî dûman.

Kanîyên esîl avên sar,
Dikin xuşîn dihatin xar,
Beybûn, rihan xemlê wan
Horî ne qîz û bûkên wan.

Ew gundê dil baristan,
Bidim methê dotê wan,
Ew niqla horî û perîyan,
Ji qudretê ew çêbûn.

Nexş û nimûnê qîz-bûka,
Bejn û bal, xal gerdena,
Xortê tûrîn xweş ordama.
Kemberê zîv navkêlê wana.

Delal bûn pîrekê navser e,
Serî kofî û kitan e,
Beşer xweşbûn ça rihan
Kanê, kuye Dîlber can...
Dişewite dilê Feqîyê Teyran.

## DÎLBER

Hey, Dîlbera benîya xuda,
Pesin û husinê te da,
Nûr û nedîrî te şemalda,
Wêran ezim malim xirab,

Hey, dîlbera gerden zerî,
Wey, nazika dêm qemerî,
Qamet ji moma fenerî,
Wêran ezim malim xirab.

Hey, dîlbera gerden zirav,
Dêm şûşeyî, tijî gulav,
Wey doxtûra bejina zirav,
Wêran ezim malim xirab.

Hey, dîlbera methê minê,
Wey nazika naz xatûnê,
Dîndarê te şebaba dinê,
Wêran ezim malim xirab.

Hey, dîlbera gerden letîf
Wey, nazika qamet elîf,
Qamet ji rihana xefîf,
Wêran ezim malim xirab.

Hey dîlbera gerden ducac.
Wey nazika misil û maş,
Qamet ji rihana qirac,
Wêran ezim malim xirab.

Hey, dîlberê, wey dîlberê,
Firîyat ji destê keserê,
Avek ji ava kewserê,
Wêran ezim, malim xirab.

Metuh û seda can dîlberê
Tu nazika lewz Esmerê,
Tu canika ruhê minî,
Wêran ezim malim xirab.

Wey, dîlbera gerden zemûr,
Porê zêrîn têlê tembûr,
Te ji mektebê kirime dûr.
Wêran ezim malim xirab.

Mîna Mecrûm bimînin deştêda,
Şibêta bilbil ezê bixwînim gulê re,
Hetanî kingê ezê bimînin vira,
Di zîndanêda û di hepsêda.

Hey, dîlbera mine kemal nasê,
Wey canika surê dikî besê,
Bejn ziravê şahê hewesê,
Weran ezim malim xirab.

Hey, dîlbera maş xelatê,
Nûr barana ji qudretê,
Tixûbê me xweş-xweş dihatê
Wêran ezim malim xirab.

Hey, dîlbera methu canî,
Wey, surgulav min heyranî
Methê sura bedew hatin,
Wêran ezim malim xirab.

Hey, dîlbera pêlav rengî.
Wey nazika nav û dengî,
Ser min çi qal û cengî,
Wêran ezim malim xirab.

Baqî ji boy rebê gefûr
Ew nazika gerden zemûr
Biskê sihîya, zilfê dihûr,
Wêran ezim malim xirab.

Hey, dîlbera nazik nav biharê,
Wey, delala maşoq yarê,
Dilê min bû kanîya ziharê,
Wêran ezim malim xirab.

Wey, dîlberê sotim bêhesab,
Avirê te kirime kibab,
Nolî baqê gula, gul venebû,
Wêran ezim malim xirab,

Nolî baqê gula, gul venebû,
Wey, nazika dilê di jar,
Te xwendinê kirime betal,
Wêran ezim malim xirab.

---

## DENGBÊJÊ JARANÎ

Ne bayî,
Ne baranî,
Ne lêmiştî
Ne narî.

Hunirê giranî,
Şemala dilanî,
Teyrê gomanî,
Dengbêjê jaranî.

Methê dilê xêjî,
Ha dinivîsim, ha dibêjim,
Ha distrêm, ha dikelijim,
Dîsa bi kaxez bêjim,
Ne qerim ne gêjim.

Dijminê mîrê decalim,
Mehmûd Feqîyê Teyranim.
Bira xudê şihedê me be
Biçûkê bêjin reme te be.

DÎLBEREK

Min dîlberek dît xewneda,
Dêm weke bedir şeweq da,
Ez kirim dîwa û sewid
Hey, gelo derman heye?

Ez kirim husin û şemalê,
Şehidê min û te xudê,
Hey gelo derman heye.

Ra li halê min qena be,
Dame ber zicir û etabê
Hey gelo derman heye.

Dîlberek dame hebîbê
Kuştim tîra reqîbê
Hey gelo derman heye.

Emir fermana teyî
Şehidê min te xudayî
Hey gelo derman heye.

## AVÊ ÇÎMA WA GÎRANÎ

Avê çima wa giranî,
Bi qanûn û qeydanî,
Tu notila min jî
Ne maşoqê sura giranî.

Avê çima ha bi kîn dilezî
Tu jî sewdalûn notila minî,
Ne disekinî, ne jî xeberdidî,
Tu jî maşoqê sura dilanî.

Gul-sosin bîn vedayî
Ser hevda şax û mêldayî.
Sed koban, huba dila kanê ye,
Ew xeyîdîye, ne navda ye.

Avê ha dikişî herdu û nerda,
Ne bihur, ne pira,
Çima rê nadî minda,
Dilê min bûye miskenê kul û derda,
Huba dila dişewet halê xuda.

Avê digerî k'ûr gerîneka,
Pêldidî ser hevda,
Qîz û bûk, bindarûka,
Ez şewîtîm halê xuda.

Avê çima kul û kîn î,
Nolanî narê min dişewitînî,
Derd û kula ha birînî,
Çima bihur nadî min sewdaserî.

# PÊLÊ AVÊ

Hey av û av, hey av û av
Ha tu bi eşqê minetî,
Mewc û pêla devê belav
Bê seknetî, bê rihetî.

* * *

Bê seknetî, bê rihetî,
Ha şibhetî qelpê min î,
Yanê aşiqê baxê xwe yî,
Tu ji eşqê nadibitî.

* * *

Ji eşqê nedibitî,
Ji eşqê tu têhatî,
Heta kengê tu bi tebitî
Li ser min bêjî heyranek.

De ez bizanim qisetê,
Ji hindikî, yan ji pirê,
Yan ji meniya vê gur-gurê
Ji kê re dikî vê teyatê.

Ji kê re dikî zikrê bê hal,
Qet guş-guşê nakî betal
Şibêta min bê emal,
Şev û roja bê minetî.

Şev û roja bi minetî,
Yek tu yî dîya şev tarî,
Qet nehewî şev û roja,
Yan ji emrekî lez ketî.

Ji emrekî, tu têyî bi lez,
Sewda serî teşbiyê ez
Ji kê re dikî bê guh û dest,
Qayîm diçî, dengê te tê.

Dengê te tê bê pê û dev,
Taytê dikî bi qelb û dev,
Peyda dibin ji mewcûyê kef,
Şîrin ji dengê qudretê.

HEZA
« Beyta min pir xweşe, gut bidin, xudan Kemal »

Ey av û av, hey av û av,
ma Tu bi eşq û muhbeTî,
Mewcê pêlan davê pêlan,
Bê sekunî û bê rehTî.

* * *

Bê rehetî û bê skineTî,
Yane eşqa ya xwe xweneTî,
yan sihbeta qelbê minî,
ji eşqa na TebiTî.

* * *

ji eşqa Tu Têyî hey,
HeTî bi ku kengê hey bê,
ji minra bibê, heyrana Te bim,
Da ez bizanim qiseTê,

* * *

Da ez bizanim vê sirê,
ji hindkî heTa pirê
ji me'nîya vê gur-gurê,
ji K'êra dikî vê Tae'Tê.

* * *

Gah-gah sipî şibhetê şîr,
Qet milê te neçûn tu tîr
Ji dengê te yar tê bîr,
Ji meyîla hebûba çûna te tê.

Lazim in te bûtek heye,
Yan melûl in menîk heye,
Yan dest û metlûbek heye,
Lew bi libasê tazeyî.

Lew bi libasê tazeyî,
Sayan bi reqê û gewazî
Ji kê ra dikî şebazêyî,
Remza di xwe eşapetê.

Teslimîya ji kê re dikî,
Remz û şera ji kê re dikî.
Hemûya bal xwe verê dikî,
Gerîyanî di muhdarê qurbetê.

Birîyayî di vê pîre dinê
Qet nanivî, nasekinî,
Qet nanivî, qet navestî.
Gerîyayî muhderê qurbetê.

Kanî dizên, av tê diçin,
Hindî xwedê dayînê û cîn,
Qet kes ew pirs nekir ji min.
Ne jî anbîyayê uhmetê.

Feqî digot:- avê we bû,
Pêxemberan aqil hebû,
Qet hewceyê pirsan nebû,
Wan dest gihabû subhetê.

Ew subheta care ewil
Pêxemberan zanîn şixul,
Eybê li nik, xelqê aqil,
Tevjêt bike nesîhetê.

Nesîhetê tevtêş bikin
Pirsê wana pêş bike
Qet wê pirsê tevtêş bike,
Li aqilan kirîyametê.

Xelqê xwedê aqilkirî,
Hem arif û kamilkirî,
Nûrek di dilda hilkirî,
Eslê qisê rê dibetê.

Wey, mûsûlman bi ulmê heyat,
Mecnûnekî hen van sifet,
Tevtên û pir yaran diket
Ji rehmeta ku zemetê.

Zamet pirî nemeş xweşî,
Pir nazikî tebet xweşî,
Bê ruhe erdêda dimeşî,
Bê dest û pê tu ji kuva tê.

Bê dest û pê bê çeng û per,
Ew mewc û pêl û fatil kar,
Ew bona min nebûye kar,
Bizanbûma vê hellatê.

Vê hîllatê qirar bike,
Bes vê surê, sitar bike,
Carek li min îzhar bike,
Usa ku fema min netê.

---

Ronahî

DOTA GURCA

Here gede, herge mîr,
Herge xulam, herge feqîr,
Ji Eyîsana merîyê kibîr,
Eşqa dila nakin bîr...

Xewna şêx dît li mal e,
Dotê lê bû dîhar e
Ew xubû gurê har e,
Kitêb defter neme bal e.

Derdê dila pir xedar e,
Welatê xelîfa derket neyar e,
Kesî lê nekir pirs-hewal e,
Şêx dişewete dil nale-nal e.

Tîtim tevî Mêrdînîye
Bi hingorê xewnê dibîne,
Li xwe şêx bûye dîne,
Sofîyê xwe diterkîne.

Ew sofîya aqil hebûn,
Li şêxê xwe bûne tima,
Ku ronaya findê gihîştê,
Ew horîya bikir bihuştê.

Ew hostayê can letîfa,
Revîye ji misra xelîfa,
Heyanî, qîyamet sal û bedîla
Methê şêxê huba cemala.

Ewî dikir pir xiyalê.
Yan, ji zîndanê yan ji malê,
Dilda keser nale-nalbû,
Ulmekî zorî zefî balbû,

Dilda keser nale-nalbû,
Zef ulmê zorî li balbû,
Xewna dîbû, lê dîharbû,
Rû sipîbû xujî kalbû.

Ulmekî zor lê cimabû,
Têl û tembûr lê nemabû,
Horî dît lê timabû,
Ronaya find û fenera nemabû.

Ronaya find û fenerê gihîştê,
Ew horîya bikir bihuştê,
Şêx dît ser banê teyatê
Huba dila bangîn diketê.

Şêx litb kaxetê dixwîne,
Perda ber xwe hiltîne,
Xewnek duda tev dibîne
Litibê horîyê can dibîne.

Şêx xewnêda ew dîbû,
Tijî demaxa zûndibû,
Siba zelal rengîn dibû,
Nûr û nedera nav kaxezê bû.

Eşqa dila her siheta,
Ew li ser dara xelîfeta,
Gelek heyf wext berda,
Hey dinalîya kul û derda.

-Sofîya gelek qîl û qarkirin,
Wana siwal gelek pêkirin,
Şêx neda tu caba kibîre,
Bi nêta xewna xwe nedîre.

x x x

-Ax, dûre roja wîya bê,
Ser hev nayê hal û reng e,
Kêrî me nayê ew nav û deng e,
Pir dibû, litba qal û ceng e,

Çemşê direş dûrin felek,
Axîn têne şêxê min gelek
Dûrin kevanê reş belek,
Dîhar bûya min tenê xetek.

-Ehelîyê temam beytilferê,
Dixwazin şêx re qencî û karê,
Ku bizanibin neynesîya suwalê,
Çavê wî dûrin ji malê.

Şêx hebû çendî dewrêşê bawer,
Wana kirin şêx pirsîyar,
Xebera ewî nekirin tu car,
Ew ker ma nolî hercar.

Me tune qe tu perde,
Herça ku bê gelek xeberde,
Eva yeka wê ser minbê,
-Hûn nabînin koka misiletê.

Ehelê bajarê pir cimaetê,
Ehelê têriz ehelê milûk,
Hindî mezin, hindî biçûk,
Xuce, axa û milûk.

-Nayêm cem we ser sobetê
Xweş nîne sewta ji we tê,
Agirê min bûye ê qîyametê,
Kul û kovan ji dilê min tê.

x
x x

-Ew çi qiseye ew çi derde,
Min û te tune tu perde,
Gelek wê ji me xeberdin,
Kes nizane derdê hêbetê.

-Sofîya pir bugdan kirin,
Methê fesadîyê pir kirin,
Sura min xedar kirin,
Xweş nîne derewa bikin.

Ya dil kirim sewda serî,
Hucur dada kilît û derd,
Ji hepsê revş dil jarî
Dil û ceger bûne kerî-kerî.

Dengê zikirê bê sewda,
Bira bên dengê evdala.
Ez bişewitim halê xuda,
Bengîya keder û xiyala.

Kul û kobana keserê,
Ku dîhar bikin wê xeberê,
Li minkin ava keserê,
Haqmaq nizanin menîya xeberê.

Wen çi dixwazin bêjin, bikin,
Hekîm bi xwe loqman bînin
Eyîsa ku qebirê rakin,
Daxa dilê min derman nakin.

Daxa agirê sor li ser e,
Heta sibê roj bê der e,
Yarê xewê rabe were,
Min nayê sikangû sebir e.

-Şêx sur nekir stare,
Hezarî digot:- Ew bi yar e
Ya min dota kubar e,
Destê hekîma bê kar e.

Kanê li ku tê bayê dem,
Çendî sofî hatine demê,
Wekê babê bextê xwe bê,
Kitêb bira bimîne hêvîya xudê.

x
x x

Te ez birime ber wefatê,
Te ez birim ser dînê şivaketê,
Te ez mektebê dîn kirim,
Bê quran, bê yasîn kirim.

Jî xûşk û bira damê şermê,
Çi bikim zêr û zîvê, xeznê,
Kal bûm ketime vê dinê
Wê bê rojekê bayê mirinê.

Şihêra wed-werde dixwînim,
Bejna bilind dêmê dibînim,
Dîn dibim ewter dimînim,
Saji sewdayê xwe nînim...

-Şêx bi xwe nebû stare,
Bi zar got ew yar e,
Ku bibîne dota kubar e,
Hespê bext bibe sîyare.

-Qameta heye şikil desta,
Tu horîya dilê parista
Te birime dêra xaç-parista,
Ez revîyam dêra û mizgevta.

Te ez kirime nava şeravê,
Te nazikê gerden şebabê,
Ez bûme hêsîrê bejn û balê,
Tê rojekê bêyî ber silawetê.

Te ez navno kirim çolê xistim,
Dîwanê derxistim sirgûn kirim,
Pêçam dêrê jî werkirim,
Dêrda kember best kirim.

Ew şêx ket x x x

Ew şêx kete çol û besta,
Bona horîya bazin desta,
Ku herin dêra xaçparista
Ew merûmê dota gurca.

Ew rengê sor gulav'in,
Xelqî, tim vir hazir in,
Hemûya bihîstin pêda girîn,
Dilê xerîba pir disotin.

Kalîn kete xelqê hindik,
Pîr û kal rabûn sivik,
Ber agirê vê qîyametê,
Bayê agir pêlesû tê.

Ew şêx kete nav mezîlê,
Çû gihîşte wê Tilbîsê,
Derd û kul ketine bîrê,
Çewa bike xwe tivdîrê.

Pêla nalînê me der,
Tu Tilbîsê dernekev der,
Çîyayê Gocor qelak li ber,
Dûrva dixweyê nola hêkel.

Bê tizbî û kember beste,
Dewreş çûne ber dawestine,
Nalîn ber tîra jarê tê,
Ax û kobana vê tewretê.

Germê gîhandîye cegerê.
Agirê dila pêlesû ketê,
Dilda lêxist kevanê tîrê,
Nalîn ji ber tîrê tê.

x
x x

Nava keçê girt hinave,
Nûra têda pêlesû tav e,
Dişewite dil û hinave
Ew nazika dilê jar e.

Nêta keçê girt esire,
Ew horîya dêm qemer e,
Şêx dît nekir şerme,
Xwe avît kirasê rûmetê.

-Şêxek hebû bê qeyas,
Bayê havînê biribû libas,
Ber xwe davît kiras,
Ewî davît perda rûmetê.

-Çendî roja mayî raketî
Çendî roja mayî hal ketî,
Şêx re gotin ev çi hewal e,
Ne te male, ne te hale.

Tu bûyî mesîyê dêmketî,
Tu mesîyê cîda reşbûyî,
Tu dêmketî neşin bûyî,
Tu maşoqê qîza gulgeşbûyî.

-Derketim rewaqa pencerê,
Singû hatin seherê,
Nezer da eşkerê,
Deng kete nav cimaetê.

Ew mişûra nav bi dinê,
Hogir çûne mame tenê,
Bûme tengezarê vê bedenê,
Ruhê min çû ma qelb tenê.

-ez avîtim xezina nav ser,
Dêmê narîn ji dêrê hate der,
Silav şêxkir bi keser,
Qecera dilê di jar.

Silav kir dota qurca,
Kalê nexweş rabû li pîya,
Li tev qîzê têr xeberda,
Tu elkana dilê dijarayî.

-Menîya evînîyê hey agir e,
Qamet lêva ta şekir e,
Lê kir pirs çend xebere,
Huba dila nûr agir e.

-Kuda têyî, kuda diçî
Dibe te manek hebî,
Nebe te hîylek hebî,
Nebe te nisîbek dixwazî,
Bîna misk muhbeyê te tê.

Şêx awa got, dikewgirîye,
Benî û bişkok litbê te ye,
Nav te qelpê me ye,
Bejna te meytera dinê ye,
Lewzê horîya bîn jê tê ye.

Bejna te ez ewter kirim,
Huba dila te ez qeydikirim,
Kilît û mifte ji muhbetê,
Dîndar tuyî ji tewretê.

Te ez ji kitêb, defter kirim,
Ez kewgirîm bi dil şewitîm,
Sêlava xwînê ez dişûştim,
Tê kingê min bêyî rem.

Kanê bêje xezala çav xirab,
Te ez sotim hertim bê hesab,
Evînîya dilê min û teb,
Zêr û zîv me tuneb.

-Herdu evînîya birq vedidan,
Te tîrek nava dilê min da,
Tu bûyî eşqa evînîya dila,
Wê bêne gotinê her cara.

Tu serî min bîne rêyê,
Te ez dînkirim berdam çolê,
Te ez dînkirim hey ewterkirim,
Ji xûşk û bira dame şermê.

x
x x

-Bedîlê xeberda hebi menî,
Te bihata kawa yar menî,
Dêm neynûka, xwîn şîrin,
Xweş-xweş şêx Kenî.

-Tu agirî reng beterî,
Tu ne lawekî gelenderî,
Tu ne xortekî gerdenzerî,
Tu ne cindîkî çak babetî.

Tu ne cindîkî, bixwe tazê,
ez tev te naxum tirîyê rezî,
ez ne sêv im tu bigezî,
Tu bi wî femî, bê malbûyî.

Tu bê femî, me malkerî.
Li ser taqetê ketî,
Tu ji kirina mal xirabî,
Tu kêrî huba dila nînî.

Mirîya yê kal û pîr,
kal bûyî haêyî kêr,
hema hevala tu hîşt vir.
Heval çûn tu nebirin xwere.

-ya dil huba mezine,
Derd û derman pê tune,
Tu sunîyî, ez eysanîme
ev sobet me nayê kêr e.

Şêx Kûr-kûr digot:
-Ez û tu kêrî hev tên,
Emê bê hubek hevdu hizkin
Heşka te got me bêkêmim.

Libas min bûn kerî kerî,
Ezê-te re bêjim yarî
Tu horîya dilê jarî.
Ez kal bûm, bûme hirî...

Sosin zemana dibirîn,
Te re bixûnim ziman farzî,
Rengê te li min nebe tarî,
Dêmê te ez kirim sewdaserî.

Bi rengê belav, reng bihirî,
Çibû ji xelqê dem hazirî,
Kê ku bihîst rûnişt girî,
Derd û kulê min nepirsî.

Emê mewlîya pir bikin,
Emê movê şebab pir bikin,
Emê wê tiberkê tamkin,
Qameta naz û namet in.

Bejna bilind minarekê,
Herşev-herşev êvarekê,
Te re bixwînim carekê,
Ew xwendin kêr me tê.

Emê şevbihêrîya şevê bikin
Pir heneka bi dev bikin,
Pir yarîya hev bikin,
Tu rûnê emê hewas bikin.

Tu rûnê sifra sobetê,
Şêx terk da vê mishebê,
Cemal ewe textê sobetê,
Rojekê wê bê terbîyetê.

Ew şekira nûr dibare,
Ew menîya paşîn ev e,
-Herge tu hatî ser ritba me,
Me re kêr nayê girîna te.

-Şêx got:- Bes e bike vê gotinê,
Te li min çi manîyayî,
Serê gişta tu ya min î,
Min tu hebandî bi vî dilî.

Li axreta melk hebûn,
Aşiqa û maşoq hebûn,
Ewana haj rojê xwe nebûn,
Ew jî hemû wefatbûn.

Methê dila qise nekin,
Aşiqa pir maşoq hen,
Her cara hevra qisa nekin,
Her dewranekê yek aşiq in.

Tu mewcûta minî,
Heyranim îdqata minî,
Ser taqetê tu rihetî,
Ser taqetê tu neynûkî.

Tu nûr û neder bê şikî,
Dûrva miskîna nasdikî,
Tu şebaba lêv şekirî,
Tu morîya reng awezî.

Tu nehnûka şayê letîfî,
Tu melhema dilê rehetî,
Tu melhema dil keserî,
Tu horîyî, tu perîyî...

Ji şahîra nexweş ezim.
Derdê dila qer û gêjim.
Nûr baranê tev davêjim.
Bona eşqa pir dengbêjim.

Katibe nexş ev in,
Mewcûta gulav in.
Nûr baran dane navê
Ezê baxê we bibarim.

Nûr û pêta fitilê ,
Agirê şêx cemalê,
Daxa dilê min qebûlê,
Emê herin vê qurbetê.

Emê bikin vê sohbetê
Emê vexwun vê şerbetê
Ew meya şîrin avê,
Dîlberê da min peyalê.

Dîlbera reng esmer î,
Te avira min kir çavî
Bide mirda fîncana jerê,
Ezê vexwum, pênabim têr.

Ezê bixwim bi hunirim,
Eşqa te ez ewter kirim,
Îro bi gilîyê te kafirim,
Dewran bedîl min hatin.

Kalîn kete xelqê binik,
Kal û pîr rabûn sivik,
Ji agirê min agir ne tê,
Bayê agirê te zef gur tê.

Agirê ji dilê me der
Vênexe kirgût û sixber,
Nalîn ji ber tîrê tê,
Xew û xusira mine tê,
Bona horîya nav cinetê.

Min û te dewran dibirîn
Min û te muhbet zor in,
Min û te methe dor in,
Gelek jêr in, gelek jor in,
Kingê wê bê bayê fersendê.

Fersend dil bi xwe ye,
Kom-kom qîz bûye bexte,
Şingîna kember û rexte,
Hela hê ne wext e...

Sebir heye bi xwe elkan e,
Text û rewaq me derdane,
Hed û heseb pê tune ne,
Ba ku bê bext bi xwe tê.

Şêx rabû kitêb destda
Ba tê ji bera kenara,
Şêx misheb avîte agirda,
Me tune gune û ceza.

Dil qecer e agir pê ketê,
Ew nayê, dike wê nisketê,
Ji min agirê Dîlberê,
T'en gihîştine nav cegerê.

x
x x

Pêxas bû, pey weşa ket,
Ew şêxê pêxas û tazî,
Cî ser postê berazî,
Sîng seref e, dur dixwazî.

Tu şerbeta ser lêva,
Zehmetê wan şev roja,
Ew sexîr bû çiqas bê sewda,
Ew maşoq bû dota gurca.

Ew mişûra dest bi qedîm,
Avîte nava agirê cenemê,
Ew neyîsî vê wefatê,
Agir cenemê dû me tê.

Ew mişûra şêxê pêxas
Jê dihatin sê sed kilamê xas,
Agir pêketîye dişewite,
Bona huba dota keleş e.

Dil şewitî xwîn diçû,
Çav bimbarek xweş vêket bû,
Şêx ser dîl ber kewgirî bû,
Sofî temam bîr kiri bû.

Gelek şev û roja,
Şêx dibûn şewq û sefa,
Pêxas pey weşa ketîye
Misleta wan dil xeta.

Ew nêta dilê min li ber e,
Bona horîya dêm qemer e,
Hewar, bûme sewda ser e,
Jî malê kingê bê der e.

Dotê got:- Dîndara şêx hurmetê.
Te li xwe avît kirasê merîfetê,
Ew rûmeta, te bê qeyas,
Te qetandîye, gelek kiras.

Qîzê dît dil pê disote,
Gazî kirê hêsir çav hate,
Nola aş, beraş disote.
Hela tê bikişînî zehmet e.

Rutva şerîf-çar bikin,
Darê kutan ber bikin,
Weşê mezin hevsar bike,
Wexta te tê evar e,
Weşê mezin were çendî dar e,
Wextê kutan wê bên yek care
Garanê bajo, bibe mal e.

Tu xweş minûnê dewletê,
Tu kemala xweş şîretê,
Qal û qîlî pir hatê,
Wekî ba bê bext ku tê.

Şêx wê derê ma pir wexta,
Ew bû şivanê van beraza,
Ew serwer pir sofîya,
Ew ji welatê xelîfeta.

Xelîfet wan, mal dimîne,
Hevriyê şêx çûne bale,
Jê re gotin bê hewal e,
Ew ewter bûye bê guman e.

Şêxê sur pê ketîye,
Çend sala gerîya bû dîn e,
Ew esila xwe nabîne,
Hêsir lê bûne xwîn e.

Ber perdê derketî,
Bejinê gul û rihan î,
Her dema kêm digerî,
Dîn kirim dota sînem perî.

Em çûne qesta xêrekê,
Bi linga çûne ber dêrekê,
Herdu diçûn pê şêrekê,
Kes nizane halê hêybetê.

Şêra çav davîtine hev
Sura bû hewar û rev
Şêx eca dil xwe avît dev,
Kesek nema wê derê.

Eslan bi xwe sura şêx e,
Min qesta dergê te ye,
Ez hatime sura recayê,
Dotê bikim pir duayê.

Tu şêxê xitmî sadiq î,
Rast e tu turemê xaliqî
Tu dîndara yek xuliqî,
Dotê bikim pir duayê.

-Ez baxvanê baxê xwe me,
Ez maşoqê sura xwe me,
Bira min here nav û deng,
Bira bêjin ew çi reng.

Şêx femkir ew xebere,
Dêmê dîlberê ha li ber e,
Sura şêx nekin der e.
Kitêb yasîn ne li ber e.

Sofîya dibên:- ya qenc ew e.
Vira herin em bi leze,
Şêx şivanê weşê bêxer e,
Ew sura xwe nake bêkêr e.

Her mêwek xemlek hebû,
Her darekê tamek hebû,
Ew nava baxê xudabû,
Dewr û bedîl bihurîn,

Xelqê bêjin:- Şêx kafir e,
Zêr baha tune, evî bêkêr e,
Hed û sicûda d ng hewar e,
Menî ew e dil xedar e.

-Ew şêxê rû remanî,
Xelqê lê kir nuxsanî,
Ew dîn e, ew xizan î,
Kes nizane feydê wî.

-Ew sofîyê ser nezera,
Şewaq ketine findê çira,
Şêx rabû wan re xeberda,
Rabûn herin miskenê xuda.

Ew horîya şêx babet e.
Dêm zabit e cî cinet e,
Ew dîbû bav namet e,
Xêr û xizne kêr nehate.

Dotê got:- Ez bi wa kirim,
Ez qismetê şêxê kal kirim,
Îman û axretê terk kirim,
Huba dila pêpes kirim.

Şêx gavanê beraza,
Kêfek hatê ser saza,
Boye huba miraza,
Ew bû şivanê beraza.

Şêx maşîya halê xweda
Ling qelişîn bûne cewê aşa,
Ew bûye şivan pir weşa,
Dotê dêrê wê kingê dêrê.

x

x x

Ser enîya şêxek hebû,
Qet mêlanê dinê nebû,
Her maşoqê baxê xwe bû.

Ew dûre ji muciletê,
Ew dûre ji benî adema,
Pir digerîya, kê dikenî,
Ber sicûdê kulkirî enî.

Kar kir sewdê axiretê,
Şîrin anîne tayetê,
Tayat bikin dem bi dem,
Çendik çend sal me bûn temam.

Gelek heyoq, gelek bi qaw,
Meth û seda can dîlberê,
Şêxê nav xizmetê
Her xizmeta me lê dike.

Zikirê mezin ji pê dike,
Xelqê ji çîya çê dike,
Hizkî mezin bi şîretê
Şîret ji benzê hakîma.

Meleka çendî li hewayê,
Dîlbera dêrê duayê,
Bangîna bang û qezîyê,
Ew kerba dev nalibitin.

Şêx dibê habe ha nabitin,
Hekîm bi loqman bibitin,
Daxa piling sor li sera
Daxa dilê min sax nabitin.

Dotê ji dêrê hate der e,
Şêx bi eşqa diçû pêşbere,
Sebir sikana min ber nêtê,
Ne şêx werdam bi xwîn e.

x

x x

-Şêx rûnişt ser kanîyê,
Fetla pêla av gihîştê,
Ew dîlbera benîyû bihûştê,
Şûşt bi ava bihuştê.

Pêlê avê xar dihatin,
Reng şebabê têlî hatin,
Temam qîz in rext û rişm in,
Şêx kal bû, rîdan bihistin.

Şêx kitab hilda dest e,
Dota gurca lêkir qest e,
Şûşa sorgulavê habideste,
Destek jê re kirîye kemberbeste.

Nûr dibarand davît navê,
Nûr-neder hukumê wê tê,
Findê fenera dişuxulin vê pêlê,
Ba tên ji qudiretê,
Daxa dilê şêx qebûlê.

Şêx rabû dilekî keser,
Weşa nekir sereder,
Dîlberê mihubeta dila pir kir
Aleva agir pêla gur kir.

-Hêsirê çavê vê nazikê,
Tên nolî vê baranê,
Dibare tixûbê vê kanîyê,
Şêx bi qedama çû pêşîyê,

Dotê got:- Dila dilbibên
Ji ezmana ewr baranin
Ji çawa birûsk dibarin.
Huba dila tev şemal in.

Şêx digot:- Demekê na tebitî,
Çima demekê tu nastirî,
Dev û dirané te şekirî,
Sor û gulav xwe werkirî.

Tu çima wa dikewgirî,
Çima îro rehet nabî,
Bê heval, bê hogirî,
Qet muhbeta dila nafikirî.

Tu dîlbera beden fîdan,
Tu nazika gerden mircan,
Tu horîya erd û ezman,
Te derdê min nekir derman.

Emê xemilê te kar bikin,
Emê kofîyê zêr û diraf bikin,
Emê bejn û bala te bikin,
Emê sura temam dîhar bikin.

Borê min xweş dibez
Methê dila dihat bi lez,
Dibezîya bengizî xweş dibû
Qet haji kesekî tune bû.

Dotê bor zîn kir
Meyter bor sîyar kir,
Ranêzkayî şêx kir,
Menîya hîylet eyan kir
Dotê şêx banî û begem kir.

Borek delal derani,
Ling ser piştê danî,
Ajot deşt û banî,
Bayê bi xwe fersend anî.

Hey benîyo-benîyê deştê,
Huba kê tev te tê,
Huba hate rikêvê,
Ewa nade tu cabê.

Nazik metel ma jê,
Şêx dema bor dibezîne,
Şêx dema bor dilezîne,
Muhbeta şêx distîne.

Dajot şibêta bayê
Mezîla siheteke gihîştê.
Dêma bestê xweş mezîlê,
Tu were vê kirîyamet.

Ewê û şêx pir qise kir,
Mihubetê, dêmsor gulav kir,
Şêx gihîştê dua kir,
Nehatin nêzîk sofî.

Sofîya şerm qîzê kir
Ewana methê wana kir,
Xaliqo binhêr, huba dila çi kir.
Xaliqo binhêr, xoce çi kir
Ew canika can bikir
Huba dila anî mîya ser kir.

x

x x

Binhêr halê qisewta
Şêxek hebû Sedenîy ,
Ew çû welatê Gurcîya,
Ew çû miqamê Ewlîya,
Dil kete dota Gurcîya,
Hemaq nizanin tu manîya.
Deng gihîşte şa ra,
Bidin methê sura
Nivîsîn ser kaxez deftera,
Ew xetê Mehmûd-Feqîyê Teyran.
Ramet dê û bavê guhdara,
Xêr hatin, şer çûne bera,
Sur hatin li dîhara,
Me da methê bext û miraza.

## YA DİL WERE

Bi qanûn û qeydanî,
Min çi zani bû notila minî,
Maşoqê sura giranî.

    Heylo dilo, bes bibêj.
    Be û baranê tev davêj,
    Eşqa dila pir bibêj.

Ya dil wer, ya dil wer,
Heçka huba dil ne bawer,
Ew ne ji ometa pêxember.

    Sêfîlo jaro ademî,
    Te diniyê nekir temî.
    Tu axretê nabî şermî.

Wekî hezar salî
Sax bî li dinê bî
Tuyê rojekê mêvanê qebirê bî.

    Hezar salî temam bî.
    Hergê şerd, hergê şam bî,
    Axirîyê kesî mirinê tem`bî.

Heylo dilo dil dibihrî
Alîk hizine, alîk şîn û girî,
Qet min wê din başer nekirî.

    Axir songî wê bimirî,
    Bispêrin kêlê kevirî
    Axîn dila tehîrî.

Heylo dilo, teyrê bê mal,
Tu pey eşqa memir, menal,
Gelekî eşq çûn bê hewal.

    Heylo dilo teyrê bê cî,
    Pey eşqê memir mejî,
    Ne mirin heye bona mejî.

Bendo, menal heqê me yî,
Hizin û girîn bê feyde yî,
Gor û kefen mala me yî,
Ew dinya boş, bê feyde yî,
Axir, oxir mirin heye.

Avê çima wa giranî,
Bi qanûn û bi qeydanî,
Ha digerî gerî nekanî,
Tu jî maşoqê dilanî.

Na xêr, notlanî min nîn î,
Ez dimirim derdê dila,
Sura giran agirê şeva,
Dişewitin nubê dila.

Avê, çima wa dibezî,
Bê pê pêlav kuda dibezî,
Bê kezbet û bê libasî,
Xerîbê notlanî min nasî.

Avê çima wa dibezî
Avê çima wa dilezî
Sewta serî kel û bezî
Tê diçî tew dota ezlezî.

x

x x

Evlîyê anîn nebûn,
Pira dewlê ne tunebûn,
Ez newcê pira, xebera nebûn.

Heta ku evlîyê bîna me nebûn,
Pira hewal me pê tunebûn,
Ewana zani bû mirin nebûn.

Ne min werin, cînar werin,
De hûn werin, tivdîr bikin
Xerina Feqîyê şirovekin.
Xwe bendê feqî xilas bikin.

Ha ten werin, xelqê dêşetê,
Hûn werin, bikin misletê,
Ez dimirim derdê dota feqîyetê...

Sibhan ji me şayê merda,
Ew kanîya cew jê berda,
Derd û derman tev da,
Em razîne huba dila.

Sibhan ji me şayê mezin,
Ew kanîyê cew lê dibezin,
Derd û derman dîsa ez im.

Çûme mêrga zemîl dest e
Belgê mêrgê zêrê kesk e
Me jî mirin xwe re dixweste.

Çûme mêrga zemîm di nav,
Belgê mêrgê zêr û dirav,
Extîyarîya min tunebû neçûm nav.

Dinya xan e, xana tijî,
Bende tê da diponijîn.
Hinek dimirin, hinek dijîn,
Ne mirin heye bona me jî.

Eva dinya xan û man,
Bende têda bazirgan,
Bazirgan diçe, xan valan,
Îro hem sibê ji çûyan.

Mendo menal, heqê me ye
Hizin û girîn bê feyde yî
Gor û kefen mala me yî
Dinya boş e bê feyde yî
Axir songî mirin pêşîya me yî.

Mendo menal-menal,
Hatine dinyayê aşqê delal.
Wana jî vedixwar kasa mirin bal.

Îro qewîn tê min girî,
Gul û sosin mêrga xeyîrî,
Sed hezar ax û kovanî,
Dev û lêvê ta şekirî.

Dev lêvê te nûr şekirî
Sed ax û kovan keserî,
Hagirin fîncana şerbetê
Ez dinalim derdê dota feqîyetê.

x

x x

Kanê Elî, kanê Emer,
Kanê Xatûna donzdeh carî,
Ew jî ax û berê serda rizîn.

Kanê Hemze, kanê Abas,
Kanê Xidir, kanê Elyas,
Kanê cimeata bi kinîyas
Tiştek vê dinê nekir xilas.

x

x x

Şêxek bebû sed anîya
Serkarê pênçsed sofîya,
Ew bûye maşoçê dota gurcîya,
Heqm ç nizanin tu menîya.

Sed eferim esilê te re,
Ez dimirim şêxê xwe re,
Çawa çû bû ez birim xwe re.

x

x x

Silêman pêxemberê nav li dinê,
Kanê Bilqîzara zêr mal xinê,
Ewana jî axir vexwarin kasa mirinê.

Kanê Silêmanê hukum li bal
Kanê Bîlqîzara mal û guhar,
Axirîyê ewê kasa ava mirin vexwar.

Heylo dilo, te min wa kir
Ew horî, xezal min unda kir
Ew horî cemal minakir.

Dilo te re dibêm vê gotinê,
Te ez dîn kirim berdam dinê,
Min çi zani bû maşoqa minê,
Wê vexwe kasa mirinê.

x

x x

Ew tirba serê kanîyê,
Xuydanê girtîye enîyê,
Me dixwaze azabê cînarîyê.

Ew tirba orta herdu ava,
Xuydanê girtîye ser û çava,
Me dixwazin azabê dê û bava.

Ev bendê Feqîyê Teyran
Keder pir man dilda
Rame dê û bavê guhdara.

## GÊLÊ Û FERXÊ

### BEYTUL FETHAYÊ

Em hene çar bira dê û bavekî,
Emê herçar borê xwe zînkin rûtbekî,
Emê sîyarbir herçar bi awakî,
Emê hildin şûr û rima cûrekî.

Emê hildin nadir û guhara,
Emê hildin xurca zîv û zêra,
Bira malda bimîne mora kibîr.
Emê xwe re bikin rav û tivdîr.

Em çar biran e, hespê me boz in,
Dinê digerin dawe û doz in,
Mişiriq sîyarbin, mifriq peyabin,
Gêla xerîba birê xwe re bînin.

Herge xatir, destê zorê ,
Emê herin ritba wê oxirê,
Bînin hizkirîya ferxê alan,
Ew maşoqê sura giran.

Methê huba dilê Ferxê ye.
Emê bi geştê herin demê ye,
Sur ku hey boyî navê xudê ye,
Hazik Gelê bînin bona birê ye.

Welatê qêrî dilê me dixweste,
Emê bînin horîya xirxal deste,
Methê dila dil pariste,
Şemsê qember ezmana rast e.

Çi sibeke metxû ye,
Herçara bor kirin zîn e,
Gêlê birê xwe re bînin.

Herçar bira dajotin,
Bor rû erdê dimşandin,
Pirs hewal kesî nîn in.

-Ferxê digote bira.
-Hûn wegerin malê,
Tişt nabin zorê.

Ez im maşoqê surê
Em nizanin miskenê Gêlê,
Ew horîye ne ji vê elê.

Ezê tenê herim gerê
Min ew dîye xewnê,
Malê nizanim kîderê.

Birê kirin rik Ferxê,
Hêrsa birê rabû wêderê,
Şibêta zikanê barê.

-Çima em çar bira nekarin bînin ewê
~~He em~~ hene fêriz û mêrxasî elê,
Neke gilî û gotina ferxê.

Emê bibînin bavê Gêlê,
Ewê bizanbin em ji kîjan elê.
Gêlê bînin bi malê dinê.

Emê bînin hebûba Ferxê
Emê zêra bavêjine mêzînê
Gêlê bikirin bi zêr yan malê dinê.

Wexta nedan bi zêr malê dinê,
Emê bînin destê zorê,
Kê dikare xeberde demê...

Ferxê got:- Gelî bira,
Hizkirina min we xuda,
Şuxul mîyaser nabe p ra.

Şuxul nabe tim huceta,
Ne jî hukumê şûr û qema,
Nekin xem û xiyala.

Ew min dîye xewna şeva
Kirîyamet ewe dayîna xuda,
Wan para vegerin ji vira.

Oxir ewe bona sura dila,
Nebêjin erê, nebêjin na,
Wê mîyaserbe hizkirina dila.

Birê mezin got:-
-Şuxulê bûtelûya nabin zorê,
Em vegerin, herin ji vêderê.
Bira qeda bibe hevalê Ferxê.

Bira para wegerîyan wêderê
Dem xetir xwestin ji birê,
Bor dajotin şibêta bayê...

x
x x

Ferxê dajot borê hêşîn
Ewerê reş kim-kimî bûn
Dikare axîn, dilî kîn.

Rîya dûr, lê bû kul-birîn,
Dihurjî hespê kihêl-birîn,
Dîndara Gêlê nûr û neder.

Bejn bilind bû, dêm narîn,
Hezara xuzîya xwe pê tanîn,
Ew horîya xal û nîşan.

Ev bû qiseweta Ferxê ala,
Xwe re digot pê re dinalîya,
Gelo ew horîya bê dîharê merîya.

Ro çû bû ava tarîyê çok dabû erdê
Xêlîya xwe kişandi bû erdê,
Xwedê nedikir rê pêşîya Ferxê.

Êwerê reşî û xêj e,
Tevîyê baranê dirêje,
Deste^hubê, Ferxê gêj e.

Ferxê dajot hespê, xuya nedikir rê,
Dikire axîn kingê bibîne Gêlê,
Ew bû qeseweta wîye şevê.

Şil bibû serî hetanî linga,
Bîra wî nedihat sur û serma,
Dajot hesp xafil qeda.

Hesp diçû fena birûskê,
Hê sibe dûr bû soyêkin bû qamekê,
Ber derê koxikekî bin erdê.

Banzda erd xortê çê,
Derî kuta derbekê,
hundurda kire gazî pîrekê.

Digot:-Ew kî ye vê şevê
Derî dikute ew kî ye?
-Derî vekin, mevanim dayê.

Derî vekir pîrekê
Got: Mevan, mêvanê xwedê
Min tune sitara şevê.

-Keremke binhêra malê
Tune cîyê hespê tenê,
Mêvan ser çava bê.

Ferxê got:-
-Min starke hetanî,
Ez rêwîme, nasekinim dayê
Şil bûm baran-teyrokê.

Pîrê cûrekî hesp cîkir
Ferxê rûnişt ser qisîlê,
Silav hev kirin wê şevê.

Xew nedikete çavê Ferxê,
Dikire axîn dest ber enîyê,
Nedixwest xeberde tev pîrê.

Pîrê anî ser sifrê,
Du nanê tisî, tasek av,
Ew bû kirîyemeta pîrê.

Pîrê kire axîn got:- Ev halê min,
bibaxşîne mêvan, kurê min,
Ez mame bê xwedî, bê xudan.

Pîrê danî kulavekî qetîyayî
Avîte ser mêvan loleke partî,
Ew bû stara pîredaykê.

Ferxê kesirî bû ser hespê,
Raza xewa şîrin xewê,
Ber pesnava xeber dida.

Dida methê horî û perîya
Cara jî xewêda dikenîya,
Hiltanî navê Gêlê.

x

x x

Şe'a nisûbet xêlî hilda,
Ro derket tevê leylan da,
Ferxê rabû ji xewa şeva.

Dest û rûyê xwe cankir demê
Ew dîse niqobû nava mitala
Pirskir ji pîra dayê.

-Eva çi bajar , dayê
Ez xerîb im, ne ji vê derê,
Ez nizanim rîya Misirê.

-Pîrê got:-Eva bi xwe Misire,
Bira pir in hakim û mîr,
Ew in xwedî û xudan vir.

Ferxê got,- Bidî xatirê xwedê
Gelo heye vî bajrîda Gêlê
Ew horî û perî ye dayê.

Pîrê dinhêrî, kenîya got:-
-Te ber xewava cara,
Dida navê Gêla xerîba.

Naz dikim, ez serşoya wê me.
Ew nazik e, eynî horîya şevê ye,
Dimîne birca seray e,
Bîst carî lê dikin duayê ye,
Kexmê hêşîn bejnê ye,

Ewê bedewetî hildayî horîya ye
Ew qîza mîr- paşa ye,
Çav reş in, kil kêr nayê,
Lêv tenik in ji kaxazê,
Diran spî ne ji sedefa
Gulîyê zer di nav mila,
Dimililin ser namla,
Têl-têl dibin nol sîmê tembûra.
Hezar xwezna xwe pê tînin,
Ev nîşanê Gêla xerîba.
Eva çendeke dike axîn û ofîn
Derdikeve ser rewaqa qesirê,
Dinhêre hercar alîyê rêya,
Vedigere tê qesirê, xeber nade,
Nizanim çi meniyî wê dest daye.

Xurê wê ye timê girîn,
Cara ber hêbetava,
Dike gazî Ferxê, Ferxê...
Digot,-Xwedê, te ez kirim agirê dojê
Ezê bişewitim bibime agir
Ezê bihelim birijim...
Herime nava ax û bera.

Min jê pirsî û gotê:
-Bidî xatirê navê xwedê
Ew kî ye, kurê kê ye Ferxê?
Ew çi hisine, çi cisin e,
Ew toremê benzî adema ye!
Bêje min re, qîza min.

Gêlê serê xwe bilindkir
Bi dilekî şikestî got,-
-Ezê bêjim pirsa rastîyeyê,
Neterbîne ew sura dila ye,
Ew xewenek xewna şeva ye,
Bira pê nehesin dê û bavê min.
Bavê min fedî nake bejn balê ye
Wê min bike mêvanê qebirê ye,
Min Ferxê dîye xewna şeva ye.
Ewe ax û kovana min şev û roja ye.

x

x x

Ferxê got-
-tu bidî xatir îman axretê ye,
Sura min jî dîhar nekî tu dera ye,
Ez im maşoqê Gêla xerîba,
Min neke gazin û loma,
Min jî ew dîye xewna şeva.

Ez welatê xerîba hatime vira,
Eşqa ewê horîya xewna şeva
Tu dêyî ez jî ewled te re.

Ferxê çend zêr dane pîreda,
-Evana xercke çend roja;
Pîrê zêr dîtin şabû xwe re,
Beşer lê xweş bû, kenîya
Got-Qet neke xem û xiyala,
Kesekî nake pexîlîya we herda,

Îro ser şoya xatûn Gêlêyo,
Ezê bêjimê mêvanê min.
Pîrê bi eşq ken lêvê.
Çû dîtina Gêlê pîrê.

Ber qesira mermer, ya Gêlê,
Sekinî bû carîke wêye hurmet
Bejn zirav bû, dêm şuret,
Got:- Pîrê tê herî dîtina Gêlê
Ew bê kêfe ne rihet
Dibe îro neşo ser û pora.

Pîrê pêpalîngava hildikişe
Methê sura wê Werxê bigotayê.
Kubar, ku ber dimeşîya
Ber koçikê kenîya
Gêlê ew dît pencerêra.

Gêlê got,- Tu hatî dayê,
Tu îro ha dikenî, pîrê
Bêje min re maneya kenîyê...

-Şikir min xêr e,
Bayê xema, xêr e
Îtqat ew nedîr e.

Ewê dilê te dixwaze,
Ew niha hatîye vir e,
Bejn bal xwe yî ordam e.

Gêlê got:-
Ew çi xêr çi mizgînî ye,
Dilê min neke hêlûna derdane,
Ezê kê ra şabim dayê.
Maşoqê sura xemsê dila ye.

-Neke xema delala min
Maşoqê te mala mindayî,
Ew cindîyî toremê horîyan
Navê wî şîrin Ferxê alan.

Şevê dinê min bû mêvan e,
Bejn bal xweş ordam e,
Bedewî hildaye Ûsibê nebîye,
Ew bi huba te tijî ye.

Ez didime te çav ronayê,
Ewî ez şandime vira
Maşoqe, maşoqê sura
Ew eynî layîqî te ye.

Gêlê şa bû ramûsa dêmê pîrê
Got:- Tu bidî xatirê navê xwedê,
Sura min nekî qet beyan,
Ez zanim menîya gilî gotina.

Pîrê got:-
Rastî heye mala xwedê ye
Ew niha çavnihêrîya te ye
Ew dikewgire boy hubê ye
Herge dikarî em herin malê ye?

Boy xatirê sura hubê ye,
Ew rusqet destê te ye,
Lê ew natebite malê ye,
Hêsir tên ji çavê Ferxêye.

Gêlê şabûna mizgînîyê ye,
Deste kinc da pîre ye,
Boy xatirê ximsê dila ye,
Çend zêr kirîn cêva pîrê ye.

Digot,-Eva perênca mizgînîyêyo
Ev hela ne nisubekî hêja ye,
Qet neke dilê xwe ye,
Ev gotin ya sura xwedê ye,
Ew hizkirina horîya ye,
Ew duayê melek û perîya ye.

Here bêje Ferxê alayî,
Ese Gêlê evarê wê bêyî,
Bira neke xem û xiyalê dinê yî
Ew îtqata min tenê yî.

Bira ew rehet rûne malê
Pexîl pirîn hemû dera,
Bira ber xwe nekeve hetanî êvarê,
Gul heyra gulê ye...

Beşerê Gêlê ken lêvê,
Şa dibû û dikenîya demê,
Xem betave bûn wê.

Pîrê eşq vegerîya malê
Ewê standi bû nisûb ji Gêlê,
Bona sura dil bengîyê.

x

x x

Ferxê derdiket derva
Dinhêrî bajêr her dera,
Xwe re nedikir Gêla xerîba.

Xwe re digot û difikirî,
Xem û xiyal dilda tijî,
Keti bû nava bera mitala.

Rê tunebû
Wê re derketa
Keti bû nava derda.

Dikewgirî digot-
-Gêlê çima nehat
Bidîta dil rihet?

Dîsa nedihewîya malda,
Hey cara diçû derva
Dikir axîn pa re dihat,

Pîrê gote-Ferxê ala,
-Neke kedera dila,
Xem xerab in te re,

x
x x

Ro diçû ava her dera,
Beysûsê find û fenera,
Pencera re avîti bû derva.

Bajar hêdî-hêdî diseqirî,
Rûniştibû Ferxê dil perî,
Çirê nedida işiq-ronahî.

Nişkeva hat dengê derî,
Hatine hundir sê perî
Xêlî kirîbûn hersê horî.

Nava wanadabû Gêla horî,
Silav da,- êvar xêrî,
Ferxê got:- Xêr hat
Ser çava, dota sînem perî.

Herdu maşoqê surê
Hev bîrastin wê derê,
Ferxê û Gêlê dil-xêrî,
Hev hizkirin hezar dilî.

Carîya sura wan starkir,
Herda hev hemêz kir,
Hev ramûsan litbenî,
Muhbet xewna şevanî.



Ponahî

Ferxê got:-
Eva wetenê bavê te ye,
Ez hatime vira sura hubê ye,
Min nekin gazin lomaye,
Ew kirîyameta xewna şeva ye.

Gêlê got:-
Hizkirina me mîyaserkirîya hukumê xwedêyî
Em bûne maşoqê sura dilane,
Min tu hebandî xewna şevan,
Gustîlkê tilîya pev guhastin.

Emê bidin methê xwedê ye
Ev xwestina min û te ye,
Ew kirîyameta yekê şabar e,
Carî sura me bikin stara.

Wana nizan bû çi heyamê şevê
Cara dilerzîn mîna meya avê,
Tirs û sawa bavê Gêlê,
Bedenê wanda diçû tîrê jarê.

Carîya mezin got awa:
-Ev cî nîn e te û Ferxê re
Pêxîla pirîn bajarê meda.
Wê cabê bidin bavê te, Gêlê.
Ewê me bike mêvanê axê.

Em herin şev hindik maye,
Bira Ferxê bimîn vira ye
Kesek nasnake ew kî ye,
Emê herin edî kawê sibê ye.

Ewana kirin tevdîra sibê ye
Gêlê got:- Ezê bêm dîsa êvarêda
Bira dua xwedê oxira me be
Emê herin ji vira ye.

Gêlê û carîya tev xêlî kirin
Soqaqê bajêrî teng re dibihirîn,
Kesî wana nekir pirs û hewal,
Ew diçûn pir lez.

Ew gihîştine qesra spî
Beta bûn xem-xiyal û girî,
Bangîn keti bû siba nûr,
Sêkin bûn dilê carîyê sexîr.

x

x x

Herdu maşoqê surê
Xatir xwestin êvarê
Carîya, ji pîra dê,
Sîyar bû diçûn terqa rê.

Borî zane bû, dimeşîya erda,
Pertav dikir gelî û gebozara,
Ewana mîna du kewa digotin,
-Em nizanin rê diçe kuda
Ferxê digot,- Me ji bor minet
Wê me derxe ser rîya rehet.

Sibe safî bû wana, rû erda
Dihat dengê şivan û gavana,
Hesp qil dibû çîya û banîyara
Rojê tîrênc raxist her dera,
Gêlê bedew bû ji horî û perîya
Bejn zirav û tarhana gelîya.
Ew rojê nûr bû hizreta dila
Merîya minê nedikir lê binêrîya.

Hespê wan sêkin bû hizreta dila
Ser kanîyê nava çayîr çîmana,
Peya bûn, ku bidin methê xuda
Ewana dest û rû cankirin avê,
Xizmet hebû boy navê xwedê.
Tivdarek dîtin bona çûyînê,
Tirsa wana bû mîrê xezebê
Wana nekin mêvanê axê.

Gêlê got:- Ez xerîbim, ne van dera
Em zû herin ji van tixûba,
Bira tu kes me nebîne vira,
Wê me bikin xwerinê tîr û kevana.

Wê biteribînin sura dila
Wê me bikin mêvan ax û ferca.
Bavê min mîrekî hure Misirêda,
Wekî em bibine kew rû ezmana,
Wê me bigire jorda bîne erda.
Wê me bigire defika xuda,
Ewê te bikuje min jî serda.
Ferxê got:-min nede tena
Tu rûnê, horîya ezmana,
Nequsîne muhbeta dila,
Ev wetenê me ye em têda,
Tu îşiqa şev û roja.
Hizkirina min û te sura dila
Em bûne hezkiriyê xewna şeva.
Heçka dike
Ew xwedê dike
Qelpa me hevkir,
Rîya qurbetîyê kir,
Li me kar kir.
Mêvanê xwedêyî
Neke qiswetayî
Neke axîn,
Neke şînê,
Ew eşqa
Me herdayî,
Hetanî neyê,
Hukumê xwedê.
Puhistîn nayê erdê,
Emê herin, neke xemê,
Horîyî, qismeta minî,
Tu erşê tarî şemalî.

x

x x

Ewana gihîştine malê
Gêlê birin ber perdê
Hineka digote toremê horîyayî
Hineka digotin ne benîyê erda ye,
Ew nisila horî û perîyane.

Ew dura adê beran,
Ew meleka rû ezman,
Bedewîya wê hîva bangan
Ew cemdana koçk seran.

Ew perîzada cinetêyî
Ew husinê cemala cinetêyî
Gerden zere, mircan menîyî
Hîv û royê bedewîya xwe dayê,

Ji bedewîya nazik Gêlê
Xeber didan ehelê bajarê Şamê,
Bi hezara motacê bejn balê
Wexta derdiket rewaqa koçikê.

Merîya emel dihîştin bona dîtinê,
Dikirne axîn hetanî kal û pîra,
Digotin,-Xwedê xweyke nezera çava
Gelo ewê jî silav bide ax û bera...

x

x x

Herçar bira digotin awa,-
-Bira serwêrîyê malê bike Gêlê:
Bira carîya biqedînin hukumê wê,
Ew aqil û kemala dinyayî
Ew toremê horî û perîyayî.

Şirîka pexîlî Gêlê kirin.
Rusayê giran pê kirin.
Kumreşî lê dikirin,
Gilîyê qolayî lê werkirin.

Jintiyî şêwir danîn,
Gilî ji gilîya deranîn,
Pexîl û qar Gêlê kirin.
Bêbextî û fêsadîya wê kirin.

Jintîya digotin:-
Ferxê ala çûye ne vir e
Emê herin cem cizreta Şamê
Emê şikayetî Gêlê bikin pê re,
Emê bidin zêr û malê dinyayê,

Bira bigirin, bikin hepsê,
Bira tê da bimîne heta mirinê,
Ewê rûmet sîyaneta me hilanîyî.

Emê bêjin ewê girtî ye
Rîya bênamûsiyê û xirabîyê.
Pêpeskiriye navê herçar birayî
Edî kesek nabêje Gêlê horîyî.

Jintîya danîn şêwrek dinyayî.
Hepsêda bi dinêda fîncana jarêyî
Xwestina me yê mîyaser be dinyayî.

Emê bêjine Ferxê
Çavê Gêlê mêrê xelqê yî
Ew kirêta rûyê mêrê me yî.

x

x x

Gêlê girtin birin hepsa Şamê,
Bê sûc û bê gune,
Lê nekirin per hewêlê girtinê.
Gêlê got:-
-Min xerîba dil bi kul, dilî kobanî,
Min daye orta xuda çîya û banî,
Melûl welatê xerîbanî.
Çima por û poşmanî?

Sê mehên havînê,
Nexweş ketim nivînê
Serê xwe hiltînim
Çavê xwe digerînim
Dora xwe nabînim
Lêzimek xûn e.

Ber serê min rûnê
Bikira şînê û girînê,
Tasek ava sar zarê mindakin.

Çil şevê min çûn temam e?
Mame nivînê da bê xwe û bê xudan,
Qinyata keda cot min heram e,

Tasek ava sar min nekir tam e.

-Jintîya dewesa avê
Dane min fîncana jarê
Çavê xwe digerînim
Hêvî-eşana dor xwe nabînim
Kasa jarê weldigerînim.

Weyla min cahilê min canikê
Min bê xwedî û bê xudanê.
Min bê zarê û bê zimanê,
Ez mame bê xwedî bû xudanê.

Hepsê mehê havînê,
Min helîya beden can e,
Ezê bibim mêvan qebrêtan e,
Ne min xwedî nu xudan e,

Cabê bidin Ferxê Alan,
Nabîne bejn û bala min,
Ezê herim nav ax û ferşan.

Aw û zarîya me nemîne erdan
Xêrê nabînin beysê men,
Destê me hevkirî hubê dilan.

Çendik roj Ferxê temam bû
Hingê girtiyê Şamê bîr anîbû
Binêr çik e halê xerîba te çi bû?

Lez Ferxê rabû diçû ye
Çavê belek hêsira dibîne,
Aw-zarê me, sebabara nemîne.

Dilo jaro, kulî birîndaro,
Welatek welatê xerîb-ano,
Bê xwedî mame, bê xudano.

Bangîya xwe dikim yekê jorîne
Aw û zarê me erdê nemîne
Bûne bayîsê bext û mirazan e.

Melûl, melûl ew diçibû
Kerîk pez çîyayê bilind dîbû
Pirsa xerîba şivan kirîbû.

-Şivano, tu wekî îlahî ye,
Bidî xatirê xwedê û rebbî ye,
Gelo halê xerîba min çî ye.

Şivan got, Ferxê, ez wîkim îlahîye,
Bes min asêke mala xwedê û rebbî ye
Tu bajo borê xwe yî nezano,
Nizanim halê xerîba te çî ye.

Herê tengezaro, tu nezano,
Ketî serê rê û dirbano,
Tu xweyê hukimî girano,
Ketî pey salix silûxê xerîbano.

Xem û xiyal pir dila,
Şivan negot pirsa rastî.
Nexwest bêje xeberê rastî.
Wekî hêsirê xûnê nebarîn.

Ferxê hêdê, hêdî wê diçû ye,
Ser gavenekîda wer bû ye,
Pirs hewal pê kirî ye.
Halê girtîya zîndanê çî ye?

Gavan go:-Herê min sexîro
Ez gavanim ser çol yabano,
Jî min dikî pirsa xerîbano
Tu tengezarê girtîyê hepsano.

-Tu wîkî nav wî îlahîye
Wer bêje xebera rastîye.
Çika halê xerîbê çî ye.
Çima nabêjî, sax yanê mirî ye?

-Ez wîkim nav îlahî ye,
Bes e min asêkî mala xwedê ye
Wextê min zef çûyî, hindik maye,
Here tuyê bizanbî halê xerîbê.

-Ewî golikvan silav kirî ye
Golikvan vedigere silava Ferxê ye
Hatî ser serê min, herdû çava ye,
Hezkirıyê nazik Gêla xerîba ye.

Herê Ferxê minî momino
Dîsa ketî serê rê û dirbano,
Boy xatirê salixê xerîbano.

-Bêje min pirsa rastîyê
Tu wîkî, şewaq daye sero bin,
Bêje pirsa aseyê.
Çika halê Gêlê çî ye?

-Bese min asekî mala xwedê ye
Keremke peyabe li erdê ye,
Bêjim te pirsa rastê ye.

-Ewê heye boy navê xwedê ye.
Mirin ku heye emrê xwedê ye.
Ew bûye mêvanê ax û berêyî.

Ferxê, rabû wê diçe.
Bira ad qirar wade be,
Rênga wan bira min heram be,
Ez moxtacê wan bira nebim.

Ezê bixwînim çendik çend zimana
Ser me da baranbin agirê ezmana
Bira dua xwedê nebe wana.
Destê me qetandin bext û miraza.

x

x x

Ferxê Ala silav dike dergevane
-Bidî xatirê sura dilane
Tu dergê ber min hilîne
Dîndara xerîba bibînim.

Dergevan cab dida ye
Heta nebe ser min emire,
Tu dîndara hizkirîya nabînî.
Qet nabîn dîndara xerîban.

Bangîna xwe kir xuda ye
Emîn cibrahî nazrîbûn erda ye,
Derge ber hilanîn xerîb dîtî ye.

Şîrqîn kete qebirstîn
Dergevan derge ber hilanîn
Dîndara xerîba xwe têr dibîn.

Ferx çavê xwe digerîn
Qesireke timtêl wê dibîn
Dîndara xerîbê têr dibîn.

Gêlê got,- Silav, sed car silav
Ketî rê dirbano
Pey salix silûxê xerîbano.

x

x x

Go- Gulê bes e bike suxunê
Wan gilîya, wê gotinê,
We wextê te mirinê...

Çavê belek tijî kilê sibhanî
Te gerdanê tijî morî mircanî,
Min tu anî bona xwe vî canî.

-Her bira tî xweşbî.
Guleke sorbî nav gulada geşbî,
Axir songî cîyê min ax-ferşbî.

.Dergevana derge da da
Bor ma dêst da.
Sîyar bû kete çolêda.

-Bira ad û qirabe wadeb
Rênga wê malê pêşîya min neb,
Hetanî halê xerîba min evb
Dîsa, girtîyê zîndana mîrê xedar.

Ferxê rabû wê diçû ye,
Ser kanîkê wê hilbûye,
Çar Gêlê bejnzirav wê derê dî ye.

Çi kanînga berave,
Gêla kiriye silave,
Xuzil min bezanbûye
We çi esil û nav e.

Gêla mezin got,- Navê min Xate,
Em firîne çi welat ber welate.
Navê min rêza we dihate.

Gêlê got,- Navê min xay.
Mehbûb çiqas dinyayê,
Navê min rêza weyî.

Navê min hebûbe bikire,
Qedirê xelqê xerîb e,
Bendê bigire resq nesîb e.

Keremke em herin nava reza,
Tevde gul, baqke qevza,
Royê du sedî bibîn şewat ezim.

Ez bazîme, ser kursîyê zêrînim,
Tu maşoqî, ez hatime,
Dîndara te bibînim.

-Herê malxirabê, dil mayê,
Aqil serî sewdayê
Wekî hevalê te çûn tu çir mayî.

-Ez ne aqilê ser sewda bûme.
Rast e hevalê min çûne ez jê mame?
Ez maşoqê dîndara te me.

Ez canikek pir xûşk û metim
Ez ax û topraxa bavê xwe derketim
Nola tavîke baranê semtê we ketim.

Ezim cisnê peza kûvî.
Serê min hilnayê zêr û zîvî.
Hezarê nola te min dikirin hîvî.

Ezê bibim kevotkeke pir xumirî,
Ezê bifirim ezmana cîkî tarî.
Kes nikare min bibîne tu carî.

Ferxê got:
-Ezê bibim teyrê per kurisî,
Ezê qeweta hewêda bifirim,
Ezê nîveka ezmanda rê te bibirim.

Gêlê got,-Ezê bibim marê teyar,
Ezê heft tebexê erdêda herim xar,
Kesek min nekare têx çar.

Ferxê got:-
Ezê Margira te rakim,
Ezê çardeh tebexa erdêda xarkim,
Ezê te xwe re hevalkim.

-Bejna min hakim jin
Sedê notilanî te motacê min,
Ew kilît mifte mala bavê min,
Kursîyê zêrîn mifte morin.

-Dilê min kela hindav da
Şûrekî heqîyê wê tê da,
Ew kilît mifte desta
Ew ji mala bavê min da.

-Ezê bibim sêva serê darê,
Ezê hêşinbim, gulê darêbim,
Kes min nabîni pêva,
Xêncî rezvanê mîra.

Ferxê Ala got,-
-Ezê bibim nexweşekî pir giran,
Ezê têkevime nav cî û belgîyan
Lêzimê bêjin nexweşo, te çi derman?
Ezê bêjim li serê darêda,
Derman sêva li serê darêdan.

Sêva sore serê darê da,
Jorda bînin sen sîngê minda,
Nexweşê wê rabe ser xwe da.

-Werê edî netirs,
Kilît û mift li dest,
Derê memika veke bê tirs.

-Malxirab, te çira zû min re negot,
Te dil hinavê min disot,
Hubê dila bûne cot.

Xêr û xêrata bidin libas
Dewerêş erda bûne nas
Bavê Feqîyê Teyran Ribas.

B E Y T A   M Î N

Dinê rabe ji wê xavê,
Weku bavpîrê, weku bavê
Xwe re bike rav û tivdîrê,
Emê jî herin wê tiravê.

Binhêr rojê, li rojgarê,
Binhêr surê li asarê,
Binhêr mêrga û xûsarê,
Binhêr avek ava kewserê.

Ro li me hate qame êvarê
Ro ku xeyrî, av nayê kêrê,
Hewayê zeherandîye belga darê
Zêr û zîv dimînin dinê.

Dilo binhêr çi girîne,
Qal û şer qet kêr nîn e
Dinya qetil, dinya xwîn e.
De tu lewsêyî bihes bîne.

Bêje, qewmê heta kengê
Bêje, lêzimê heta kengê.
Bira nevsa xwe bide tembê
Neçe nêzikî wê qewimê...

Dil nema, me ewê base
Dilo nema me was-was e.
Beyara xilmetê nas e
Ne hîşyar e xeliqê texs e.

Çi berda ji gerdûnê,
Gavekê rabe, demkê rûne,
Tu natirsî ji etûnê,
Tirs û xof ranebe dinê.

Li nav agir li ber pêtê,
Dilo jaro, xewa kê tê,
Felek gorg Ecel pê tê,
Şer û let li ser me tê.

Dilo rabe ji xewarê
Noponije nolî bavpîrê,
Wê bên rojê ferwarê
Nekin axîna qeyd û zincîrê.

Binhêrin mêrga zemîl di nav,
Gelo dil çima bûne boşav?
Belgê mêrga zêr û dirav,
Min qutar nekir herim nav.

Dilo binhêr çi girîne,
Alîk şayî ye, alîk şîn e
Felek kesî re na dûmane.
Avê şêl û kanîya na namîne,

Dilo xozil bihat bayê teyatê
Xewnek ji xiyala qudretê
Xwestina min bêjin cimaetê
Agirê qîyametê pey me tê,

Tû yî kalî hal ketî
Tî xew malî
Tî yek carî,
Tî guhê giranî.

Seyad hat te madenkin
Ruhe ji qefesê derkin,
Nebê nayêm, nebê nakim
Ecel hatîye te qewxak.

Zeman kal bû ji sermayê
Rewna rabû li dinyayê
Ji boşava guşîn nayê,
Hewa sar bû li sermayê.

Varê daye ser vavêrê,
Edî şîret nayê kêrê,
Emelê xirab çênabin
Mirîyê gora ranabin.

Bihar bihirî, av kêm bûn,
Heft hezar bax ber çêm bûn
Gul û rihan tevda dêm bûn.
Ceweka dengê avê nayên.

Bihar bihirî ji nîsanê,
Gul, rihan û beybûn kanê
Xuzîya heyamê zozanê,
Li geştê li seyranê.

Li zozana gîhayê ter çû,
Şîrin şebabê min ter çû,
Mîna bayê kelam par çû,
Ew nazik ku da çû?

Bihar buhurî li van wara,
Xew nayên li zozana,
Xwedîyê kemalê û qirara,
Kes namîne dewsê wan re.

Havînê payîzê kire gazî
Dara xizêm pêça hev razî,
Belg weşandin mane tazî.

---

## S E R E C E M


Serebend .......... I
Wefatbûn .......... I
Bilbil .......... 2
Axîn .......... 2
Milkê Rêzê .......... 3
Axîna Feqî .......... 3
Mirin .......... 4
Feqî û Şivan .......... 4
Feqîyê Teyra Hepsêda .......... 5
Girîna Feqîyê Teyran .......... 6
Ernûsî .......... 9
Wê hilşe pira Zulmkara .......... IO
Kaxez .......... II
Dewran .......... II
Girtin .......... I2
Wê bê zeman .......... I3
Miskên .......... I3
Biratî .......... I4
Qelem xêj .......... I5
Çîyayê bilind .......... I6
Nalîna Feqî .......... I7
Hawer .......... I7
Dengê Feqîyê Teyran .......... I8
Ziman .......... I8
Dewletî û Feqîyê Teyran .......... I9
Wefatbûn .......... 20
Teyrim .......... 20
Ha dibêjim .......... 2I
Serê salê .......... 22
Ê bên .......... 22
Herê Beytê .......... 23
Exbal .......... 24
Kitêb .......... 25
Bendê şahîra şitavan .......... 25
Ro çû ava .......... 26

Hey dîlber .............................. 27
Padşahê erşa ............................ 27
Beyta min ............................... 28
Xedara hakîm boş ........................ 28
Mikis xweş weten ........................ 29
Litb .................................... 29
Dewsa tîra .............................. 30
Axîna Feqî .............................. 30
Hêsir para têye ......................... 3I
Kanê .................................... 3I
Heta bê ................................. 32
Methê dotê .............................. 32
Dinya heye .............................. 33
Xuzîta nehata ........................... 33
Aqilê sivik ............................. 34
Bîr nakim ewî xortî ..................... 34
Hey Felekê .............................. 35
Dilê birîn .............................. 35
Emir .................................... 36
Temî .................................... 37
Ji rengê dîlbera horî ................... 37
Rojê esel e ............................. 38
Feqîyê Teyran û cînartî ................. 39
Dê û bav ................................ 40
Birînê xedar ............................ 4I
Wesiyetê tebîyetê ....................... 42
Avê ..................................... 43
Bêjn û bal .............................. 43
Pesin ................................... 44
Gêlavîyê ................................ 45
Bendê sobetî ............................ 48
Bext merîya sîyar ....................... 50
- Şebab ................................. 5I
Feqîyê şîrin delal ...................... 52
Karik namînin bin selika ................ 52
Dewê Meşkê .............................. 53
- Min kire axîn ......................... 53
- Werê bi nar ........................... 54

Rihan .......................................... 55
Fesil .......................................... 56
Pêlît .......................................... 56
Hey gulbihar .................................... 57
Feqîyê Teyran û dur ............................ 58
Tebîyet ........................................ 59
Bihara xêrê .................................... 60
Bihara nûr ..................................... 6I
Teyr bû teyrê bazî ............................. 6I
Dîlbera horî ................................... 62
Dîlbera Feqî ................................... 63
Xedar .......................................... 64
Hey gul ........................................ 65
Bayê felekê .................................... 66
Minminîk ....................................... 67
Mêvan .......................................... 68
Dîlber ......................................... 69
Dengbêjê jaranî ................................ 7I
Dîlberek ....................................... 72
Avê çima wa giranî ............................. 73
Pêlê avê ....................................... 74
Dota gurca ..................................... 77
Ya dil were .................................... 97
Gêlê û Ferxê -Beytul Fethayê ................... I02
Beyta min ...................................... I24